Rêxistinê cinîyanê kurdan yê tewr verênî

TARÎXÊ şarê ma kurdan de zî cinîyê winasî estê; Zerîfe Xanim ra hetanî Mîna Qazî, Leyla Qasime ra hetanî Arîn Mîrxane belkî bi seyan cinîyê kurdî mucadeleyê raxelisîyayîşê kurdan de bîyê sembolê ruhê

RÛPEL 10

Li bihişta kitêban: Jorge Luis Borges

CÎWANMERD Kulek vê hefteyê jî behsa edîb û nivîskar Jorge Luis Borges kirîye. Borges di saxîtîya xwe de bû şahidê du şerên mezin ên cîhanê, û li welatê xwe şeş derbeyên leşkerî û sê rejîmên dîktatorî dîtin.

RÛPEL 13



Kurtefîlmê Zelal çîroka jinan e

KARAKTERA fîlm Zelal bi lawê xwe Îbo re dijî. Mêrê wê mirîye. Wer di malê deye. Rojekê hevala wê Seherê jê dixwaze ku ji dêvla wê biçe kar. Zelal li cîyê ku çûyîyê li tiştekî jibîrkirîye rast tê.

RÛPEL 14

bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ

HEJMAR: 10

06 - 12 ADAR 2017

www.basnews.com

PROSEYA ÇARESERÎYÊ:

MESÛD BARZANÎ DERÎYÊ ÇARESERÎYÊ VEDİKE!

SERDANA BARZANÎ BÛ ROJEVA TİRKİYÊ

Dengvedena serdana Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî bo Tirkîyê berdewam dike. Di serdana Barzanî ya hefteya borî de Ala Kurdistanê li balafrxaneya Atatürk a Stenbolê û li balafrxaneya Esenboğa ya Enqerê hat bilind kirin. Bilindkirina Ala Kurdistanê bûye rojeva Tirkîye.

BARZANÎ BO DESTPÊKİRINA PROSEYÊ HEVDÎTİNAN DİKE

Serok Barzanî destpêkirina proseya çareserîyê, rawestandina şer digel Serokwezîr Binali Yıldırım, Serokkomar Recep Tayyip Erdoğan, siyasetmedarên kurd Ahmet Türk û Sırrı Sakık, gotûbêj kir. Sırrı Sakık, bo heftenameya Basê aşkere kir ku Barzanî amadebûna xwe bo destpêkirina proseya çareserîyê anîye ziman.

EKREM IDLIBÎ >02

Serok Barzanî misogerîya aştîya hundur û derve

MUSA KAVAL >05

Arêşeyên Rojhilata Navîn û paşeroja kurdan

JAN DOST >06

Zimanê kurdî yan zimanên kurdî?

NADÎRE GÜNTAŞ ALDATMAZ >10

"Mehelî û kırmanckîya înan"

PARTÎYA HUR:

LAZİME DESTÛRA 12Ê ÎLONÊ BİGUHERE

SEROKÊ Partîya HUR Zekerriya Yapıcığlu bo heftenameya Basê re axivî. Yapıcıoğlu aşkere kir ku ligor nêrîna wan, destûra ku cuntaya derba 12ê Îlonê çêkirîye lazim e bê guherandin.

03



ADEM GEVERÎ:

BARZANÎ JÎYANA XWE BO AZADÎYÊ TERXAN KİRİBÛ

PARLEMENTERÊ HDPê Adem Geverî ji heftenameya Basê re behsa jiyana Melle Mistefa Barzanî kir. Geverî aşkere dike ku Barzanîye Nemir, di hemû jîyana xwe de her têkoşîna azadîyê da.

07

EKREM IDLIBÎ

Serok Barzanî misogerîya aştîya hundur û derve

Rola serokan di rizgarkirina xelkê û dîyarkirina hêvîya neteweyî û rêbaratîya wan ji bo amrmancên mezin, di dîroka gelan de aşkara ye. Helbet neteweyê kurd jî di xebata xwe ya dirêj de, gelek serok û kesayetîyên bihêz dîtîye, ewa ku ez dixwazim di vê gotarê de ronahî bixim ser de, rola birêz Mesûd Barzanî, weke serokê neteweyekî ku karîye armancên neteweyê kurd ji xewn û xeyal ve bike rastî, her çiqas ku pênûseke nedîyar yên weke min nikare di gotareke wiha de heqê xebat û westandina vî serokê mezin bike.

Ji alîyê sîyasî ve, Serok Barzanî piştî Raperînê (Serhildan) heta niha roleke sereki û yekalîker di pêşvebirina proseya sîyasî û bihêzkirin û avakirina bingeha hikûmdarîya rast li Herêma Kurdistanê de. Bi hebûna kesayetîyeke wiha bihêz negengaz bû ku Herêma Kurdistanê bikaribe di nav ew hemû alozîyên sîyasî û berjewendîyên dij bi hev û dij bi gelê Kurdistanê, xwe bigire û berdewamî bi mayîn û zêdekirina destkeftan bide.

Di vê derbarê de mirov dikare zêdetir qala du mijaran bike, ku Serok Barzanî çawa karîye di nav wan nakokîyên cîhanî û herêmî, berjewendîyên gelê kurd misoger bike û berovajî hemû deverên din yên Rojhilta Navîn, Herêma Kurdistanê bike herêmeke aram û her wiha çawa karîye ew hemû berjewendîyên ku dijî gelê kurd bûn digel berjewendîyên gelê kurd hevseng û rêkxistin bike, di vê derbarê de jî mirov dikare gelek belgeyên dîplomasî, aborî û hevpemanîyên serbazî nîşan bide ku vê rastîyê piştrast bike.

Ji alîyê dîplomasî ve jî, niha zêdetir ji 40 Konsûlxane û nûnerên welatên bîyanî li Hewlêra paytext hene ku di nav de, konsûlxanyên 5 endamên he timî yên Civata Asayîşa Navdewletî jî heye.

Beşdarîkirina Serok Barzanî di çendîn konferansên giring yên navneteweyî yên weke NATO, Davos û Konferansa Asayîşa Munchenê û serederîkirin bi serok Barzanî re weke serokê dewletê di konferansê de dide dîyar kirin ku xwedan hikmet û lêzanîn e û serokekî naskirî di asta cîhanê de ye. Weke mînak konferansa asayîşa Munchenê ku serokên 60 welatî beşdarî têde kiribû, şanda Herêma Kurdistanê bi serokatîya Serok Barzanî ku takane herêm bû di cîhanê de beşdarî kiribû- yek ji çalaktirîn şand bû ku 25 civînên dualî di asta bilind de pêk anîye ku ya herî giring; civîna bi Cîgirê Serokê Amerîka, Netewên Yekgirtî, Wezîrê Parastina Almanîya, Wezêrê Derveyê Îranê û çendîn hevdîtinên giring yên din bûn, ew jî giringî û rol û pêgeh û bandora Serok Barzanî di qada herêmî û cîhanî de nîşan dide. Civîna Serok Barzanî bi şanda bilind ya Îran, Erebistana Siûdî û Tirkîye, di demekî de ye ku ev sê welat weke axayê herêmê di kêbirêkêyek tund de ne, lê her kesî fokûsê liser kesayetîya Serok Barzanî dikin.

Ji alîyekî din ve, eger em qala cemserên (qutub) hêzên cîhanî yê weke Rûsya û Amrîka weke nûnerên Bilûka rojilhat û rojava bikin, dibînin ku kesayetîya Mesûd Barzanî di têkilîyên xwe bi her de welatan re hevseng û zelal bûye, hevdîtinên Serok Barzanî bi Serok Bush û Serok Obama di Koşka Spî û hevdîtin bi Serok Pûtîn di Koşka Krêmlîn wê rastîyê diselmîne.

Ji alîyê aborî jî, em dibînin ku kompanîyên mezin yên warê neft û gazê yên weke Exxon Mobile ku mestirîn kompanîya neftê ya Amerîka û cîhanî ye, kompanîya Total ya Fransa, kompanîya Gazprom ya Rûsya ku mestirîn kompanîya petrol û gaza Rûsya li Herêma Kurdisanê, karê berhemanîna petrolê kirine û her wiha tê pêşbînî kirin ew rêkeftina stratêjîk ku di vê dawîyê de ku kompanîya Rozneftê bi Herêma Kurdistanê re kirîye, bi kirîna neftê, Herêma Kurdistanê ji krîz û goşegirîya aborî rizgar bike.

Ji alîyê leşkerî jî, Herêma Kurdistanê di sala 2003 ve, bi beşdarîkirin di proseya azadkirina Iraqê, karîye bi hevkarîya Hevpeymanên Navdewletî, bingeheke xurt ji alîyê serbazî jî darije, jiber ku îro Hêza Pêşmergên Kurdistanê gelek ji Artêşa Irqê baştire û weke hêzek nizamî yên dewletî û neteweyî di qada cîhanê de tê naskirin ku parastina bihayên demokrasîyê, mirovatîyê û şaristanîyetê dike, her wiha, jiber şerê DAIŞê Hêza Pêşmergên Kurdistanê bi bandortirîn hêza bejahî ye li Iraqê.



Proseya çareserîyê:

Mesûd Barzanî derîyê çareserîyê vedike!

RABİA ÇETİN

HEWLDANÊN Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî berdewam e da ku pevçûnên li bakurê Kurdistanê bi dawî bibin û pêvajoya aştîyê ji nû ve dest pê bike. Serok Barzanî hefteya borî hatibû Tirkîyeyê piştî hevdîtina wî ya bi Serokwezîrê Tirkîyeyê Binali Yıldırım li Konferansa Asayîşê ya Munchenê ku di navbera 17-19ê meha Sibatê li Almanya pêk hatibû. Yek ji babetên sereke yê hevdîtinên Barzanî pêvajoya aştîyê bû. Mesûd Barzanî bi Ahmet Türk, serokê şaredarîya bajarê mezîn yê Mêrdînê û Sırrı Sakık, hevserokê şaredarîya Agirîyê re jî hevdîtin pêk anîbû. Ligel vê di maweya serdena Barzanî ya bo Tirkîyeyê de yekem car Ala Kurdistanê him li Balafirgeha Atatürkê ya li Stenbolê him li Balafirgeha Esenboğa ya li Enqereyê û li otelên lê mabû hatibû daliqandin. Nasyonalîstên tirk bertek dan lê bersiva wan jî dîsa Tirkîyeyê da. Serokwezîr Binali Yıldırım, bi taybetî derbarê gotinên serokê MHP Devlet Bahçeli yên li dijî ala Kurdistanê de ev bersiv da, “Hin gotegot hene liser alê. Li gor destûra Iraqê, Hikumeta Herêma Kurdistanê otonom e. Parlamentoya wê, serokwezîrê wê, wezîrên wê, ala wê heye û li hemû cîhanê bi vî awayî tê naskirin. Wek ku tiştekî nedîtî be ketîye rojevê ku ne gengaz e mirov vê bi nîyeta baş rave bike.”

Li başurê Kurdistanê jî bilindkirina alê wek “Tirkîye, bi bilindkirina Ala Kurdistanê destnîşan dike ku ew awayê sîyaseta Barzanî, zimanê wî, ala wî dipejirînin” tê şîrovekirin.

Li gor agahdarîyên ji derdora Hikumeta Kurdistanê hatine wergirtin herdu alî jî ji Barzanî daxwazên wan hene ku pêvajoya çareserîyê ji nû ve dest pê bike. Barzanî di dawîn serdana xwe de got pevçûn û kaos zirarê dide herdu alîyan jî û divê bê rawestandin. Tê ragihandin Barzanî ji herdu alîyan re jî gotîye ew amade ye roleke çalak bigre ser xwe bo aşitîyê. Ya din, hatibû derbirîn ku Hevserokê HDPê Selahattin Demirtaş ku ji 4 Mijdarê vir de girtî ye, di serdana dawîn a bo başurê Kurdistanê de di hevdîtina bi Barzanî re rojeva wî sereke dawîlêanîna pevçûnê û nûvedestpêkirina pêvajoya aştîyê bû. Tê zanîn Barzanî di sala 2013an de jî di pêvajoya aşitîyê de rola wî hebû. Lê herçiqas têkçûna pêvajoyê, destpêkirina şer, girtina wekîlên HDPyî rê li pêşîya aştîyê bigre jî, tê zanîn ji bilî HDP partîyên din bawerîya xwe bi Barzanî tînin bo pêvajoya aştîyê. Ligel ku di sala 2015an de di serdana bo Tirkîyeyê de dema Barzanî ligel HDPê civîya bû û nêrînên xwe yên derbarê îlankirina rêvebirîya xweser, şer û qedexekirina derketina kolanan gotibû, Figen Yüksekdağ, Hevseroka HDP, ji Barzanî re gotibû “ev mesele ya me bixwe ye”, Barzanî dîsa jî bo pêvajoya aştîyê ketîyê dewrê, ev li bakurê Kurdistanê bi awayekî erênî tê nirxandin. Di çarçoveya hemû van geşedanên nû de, di rêya ber bi aştîyê de li Bakur serdana Barzanî çawa tê şîrovekirin?

“Bo berdewamîya dîyalogê berpirsyarî li Barzani jî dikeve”

Sırrı Sakık, hevserokê Şaredarîya Agirîyê ku di hevdîtina Barzanî û Ahmet Türk de cî girtibû, “Me ji Barzanî re got bo pêşîya sîyaseta demokratîk bê vekirin, pêvajoya aştîyê bê vejandin, berpirsîyarî li cenabê te jî dikeve” û hûrgilîyên hevdîtinê ji heftenameya Basê re vegot “Ji bo dîyalog ji nû ve dest pê bike divê em her yek ji kujekî ve bigrin. Lazim e rêyek din bê dîtin ji bilî şer û pevçûnê. Ger li Tirkîyeyê atmosfera aştîyê were, pêvajoyeke nû dikare dest pê bike. Em mecbûr in liser vê meseleyê bisekinin ku ev atmosfer ne berdewam be. Daxuyanîya Barzanî ya derheqê Hevserokê HDPê Selahattin Demirtaş û wekîlên din î girtî, di cî de bû. Dema me jê re got di vê mijarê de ew jî berpirsîyarîyê bide ser xwe, wî got ew ê tevkarîya me bike. Di vê çarçoveyê de bo çareserkirina kêşeyê Barzanî jî wê hewl bide.”

“Rûdaneke baş e ku Barzanî dikeve dewreyê”

Mehmet Öcalan, brayê Abdullah Öcalan jî got rûdaneke baş e ku Barzanî bo aştîyê dikeve dewreyê û wisa dewam kir “Kêşe bi rêya şer û pevçûn, xwîn û kuştinê nayê çareserkirin. Lazim ê kêşe bi rêyên demokratîk bên çareserkirin. Bi taybetî kî tevkarîya çareserkirina kêşeya kurd bike, divê em spasîya wan bikin.” Öcalan derbarê vê de ku hin derdor dibêjin li piştperdeya serdana Barzanî ya bo Tirkîyeyê de hewlên Hikumeta Tirkîyeyê qanihkirina kurdan bo giştpirsîyê heye, got “Dibe ku hilbijêrên kurd bawerîya xwe bi vê serdanê neanîbin. lê ev gaveke baş e ku Barzanî bo aştîyê dikeve dewrê.”

“Bo çi bertek didin li hemberî Ala Kurdistanê?”

Altan Tan, Parlamenterê HDPyê Dîyarbekirê dîyar kir hemû derîyên aşitîyê girtî ne û nayê pêşbînîkirin ka piştî giştpirsîyê gaveke bi vî awayî bê avêtin an na. Lê Tan serdanên Barzanî yên bo Tirkîyeyê bo vebûna derîyên aştîyê wek rûdaneke girîng dibîne. Tan dîyar dike hevdîtina Barzanî ku derheqê serbestberdana parlamenterên girtî de li Almanyayê bi Serokwezîr Binali Yıldırım re pêk anîbû bo çareserî, dîyalog û aştîyê girîngîyek wê heye. Tan li hemberî nîqaşên piştî bilindkirina Ala Kurdistanê destpêkirine, bertek da û got “Bertek û heqaretên dijî Ala Kurdistanê şaş in. Serokê MHPê lidij alên Yewnanistan, Bulxaristan, Ermenistan, Kosovayê dernakeve lê lidij Ala Kurdistanê derdikeve. Çima aciz dibin ji ala kurdan ku dibêjin em hezar sal e bra ne, divê ji vê kêfxweş bibin.”

Karîkator ------------------------ Dijwar Ibrahim

GILÎKIRINA YASAYÎ BO ÊRIŞÊN LIDIJ BARZANÎ Û ALA KURDISTANÊ

Derdorên nêzî Hikumetê libakirina Ala Kurdistanê wek peyama naskirina Kurdistana serbixwe dinirxînin û di wê nêrînê de ne ku ev gaveke girîng e bo têkilîyên Tirkîye-Kurdistanê. Lê tenanet nasyonalîst û MHPyî bertek dan bo vê û daxuyanîyên heqeratwarî dan. Parêzerê Şirnexî Ali Bayram û Baroya Dîyarbekirê, parêzerê Baroya Rihayê Süleyman Şeyhnebi, parêzer Neşet Bilek, bi tawanbarkirina “tehrîqkirina gel bo kîn û neyartîyê, û biçûkxistin”ê gilîyê yasayî kirin jiber heqaretên lidij Barzanî û Ala Kurdistanê. Derdoren nêzî Hikumeta Kurdistanê dîyar kirin ku ew ê derbarê van şîroveyan de daxuyanî nedin jiber ku him Hikumeta Tirkîyeyê him kurdên Bakur bersivên di cî de dane.

HUDA PAR daxuyanî da; bo çi ji giştpirsîyê re dibêje ‘Erê’?

CESÎM ÎLHAN

PARTÎYA Dawa Hur (HÜDA PAR) daxuyanî dabû wê bo giştpirsîya 16ê Nîsanê de ya bo guherîna destûrê ku dihêt pêşbînîkirin sîstema Serokdewletê bixwe re bîne raya ‘Erê’ bide. Zekerîya Yapıcıoğlu, Serokê Giştî yê HÜDA PARê, derbarê sedema vê biryara partîya xwe, kêşeye kurd, sîyaseta kurd û ger pêvajoya çareserîyê destpêbike daxwazên partîya xwe ji Heftenameya Basê re axivî.

HÜDA PAR partîyeke çawa ye? Xwe çawa pênase dike?

Bismillahirrahmanirrahim

Bernameya Partîya Dawa Hur wisa dest pê dike: Xwedayê Mezin, dinya û her tiştê nav wê de bo xizmeta mirovan afirandîye û kirîye xizmeta wan.

Xwedê ev ferman daye pêxemberên xwe: Hûnê bi edalet hukimdarîya hemû mirovatîyê bikin, hûnê liser rûzemînê edaletê bikin serdest. Yanê, Xwedê peywir daye pêxemberan ku zilm, zordarî û zextên liser mirovan hatine ferzkirin ji holê rakin. Înşale armanca partîya me jî ev e. Jixwe me ev di destpêka bernameya xwe de wek yekem armanca xwe nivîsandîye û wek yekem made jî me sazkirina edaletê dîyar kirîye. Em hewl didin bo sazkirina edaletê çi ji destê me tê bikin.

HÜDA PAR partîyek îslamî ye. Em dikarin bêjin ji sedî 90ê damezrênerên HÜDA PARê kurd in; xala destpêkê ya tevgerê Kurdistan e. Lê armanca me, hedefa me ne ew e ku em tênê bo kurdan bixebitin. Ango peyama me ne tenê bo kurdan e. Em dixwazin xizmeta hemû mirovatîyê bikin.

Navê HÜDAR PAR û Hizbulahê bi hev re derbas dibe. Sedema vê tawanbarîyê çi ye?

Di nav HÜDA PARê de kesên ku berê di nav refên Hizbullahê de bûn hene. Ez qala Hizbulaha Kurdistanê ya li Tirkîyeyê dikim, ne Hizbulaha Îranê ango ya Libnanê. Gelek cudatî hene navbera Hizbulaha Libnan û ya Kurdistanê de. Hizbulaha Libnanê şiî ye, Hizbulaha Kurdistanê sunnî ye û piranîya wan ji mezheba şafî ne. Dema hin kes ji min dipirsin “Hûn dewama Hizbulahê ne?”, ez vê bersivê didim wan: Ma Hizbulah xilas bûye ku em dewama wan bin. Ya din, Hizbulah tevgereke cuda ye, cemaetek e. Em partîyeke sîyasî ne û vê dibêjin: Him li Tirkîyeyê him li Kurdistanê yekem partî em in ku derketîye ser dika sîyasetê û dibêje “Em partîyeke îslamî ne.” Lewma çiqas cemaet, komele û sazîyên îslamî hene, em dixwazin raya hemîyan bigirin û di nav sîyasetê de ew daxwazên wan î ligor bernameya partîya me çi be, wan bînin cî.

Îro li Rojhilata Navîn şerekî giran heye, tê gotin ev şerê mezheban e. Tu jî wisa difikirî?

Em di vê bawerîyê de ne, rojavayê cîhanê yanê Amerîka û Ewropa dixwaze li her deverê cîhanê şer derkeve da ku ew çekên xwe bifroşin. Dixwazin vî şerê nav misilmanan de wek şerên mezheban raber bikin û bi vî awayî mislimanên sunnî û şîî bera hev bidin. Bi rastî jî pir cext dikin ev şer bibe şerekî mezhebî. Dixwazin ji Pakistanê heta Mexrîbê misliman bi hev kevin û têkevin nav şerekî giran. Lê wek me di destpêkê de jî got, ev şerekî sîyasî ye, ne mezhebî ye û çareserîya wê dê sîyasî be.

Navbera Dewleta Iraq û Herêma Kurdistanê de alozî hene. Hûn vê çawa dinirxînin?

Em dibêjin gelên li Iraqê dijîn ji herkesî baştir bi rewşa xwe dizanin. Ew ê bizanibin biryar bidin ka bo wan çi baş e û biryara derbarê dahatuya xwe de bidin. Ger, temama gelê Iraqê yanê ereb, tirk, kurd û yên din dibêjin “Em naxwazin bi hev re bijîn, bila herkes di rêya xwe de here”, ewçax lazim e gelên din ango welatên cîran û yên din rêz bigirin bo biryara wan û piştgirîya wan bikin. Ji gava ku Birêz Barzanî fikra xwe eşkere kirîye û nîyeta xwe kişif kirîye, me gotîye ger gelê kurd bi vî awayî biryar bide em ê piştevanîya wan bikin. Ger gelê Kurdistanê bi îradeya xwe dibêjin “Ji niha şûn ve em Kurdistaneke serbixwe dixwazin” divê herkes vê îradeyê qebûl bike û rêz jê re bigre. Em vê, wek cîran ji Tirkîyeyê re jî dibêjin. Ger hûn dibêjin “Kurd birayên me ne” ewçax lazim e hûn piştgirîya wan bikin. Me ev bang li hikumeta Tirkîyeyê jî kirine/dikin. Ji mêj ve ye kurd her tim li alîyê biratî û aştîyê sekinîne. Lê digel vê her dem zilm li wan hatîye kirin. Ger îro Dewleta Federal a Iraqê ji dahata petrolê para kurdan nede, ew ê çawa bi hev re bimeşin? Ger gel vê dibêje “Ji dêvla ku em ê her roj bi hev kevin, em ê bibin du cîranên lihev, ji dêvla ku em têkevin qiriqa hev, em ê ji hev veqetin û nav aramîyê de bijîn” divê em rêz bigrin ji vê re.

We gotibû di giştpirsîya 16ê Nîsanê de em ê bêjin “Erê”. Ev biryara partîyê ye ango meyla kurdan ev e?

Helbet em nikarin bêjin gelê me hemû dibêjin “Erê” ango “Na.” Belkî nîvî ji wan dibêjin “Erê” nîvî jî dibêjin “Na.” Yanê dikare bi ser herdu alîyan ve jî biçe. Ihtimal heye dikare “Na” jî derkeve. Di encama îstişareyê em mutabiq man ku bêjin “Erê” û bang li aligirên xwe, girseya xwe kir ku bêjin “Erê.” Helbet yên dibêjin “Na” jî li gor xwe sedemên wan maqûl hene. Lê em nabêjin yên dibêjin “Na” hemû li alîyekî ne. Kes nikare bêje Partîya Saadet û HDP fikra wan yek e ku dibêjin “Na.” Bi heman awayî kes nikare bêje HÜDA PAR û MHP jî liser heman fikrê ne ku dibêjin “Erê.”

Bi rastî ligor nêrîna me, destûra ku cuntaya derba 12ê Îlonê çêkirîye lazim e bê guherandin. Yên dibêjin “Na” tê wê wateyê ku dewama destûra cuntayê dixwazin. Ev destûr heta îro 18 caran hatîye guherandin û ger gel bêje “Erê” wê cara 19em bê guherandin. Yanê ev guherîn jî wê têr neke. Lê ev guherîna qismî ji neguherîna destûra 12ê Îlonê çêtir e. Em wisa difikirin û lewma dibêjin “Erê.”

Li gor nêrîna we, ji encama vê giştpirsîyê gelo wê hêvîya çareserîyê jî derkeve?

Îhtimal heye derîyek vebe. Bo çi? Ger sîstem bixwaze kêşeya kurd çareser bike jî sîstema wesayetê nahêle. Ger ev guherîn çêbibe û dengê sîstema wesayetê bê birrîn û bê kêmkirin, ihtimala çareserkirina kêşeya kurd wê xurttir bibe. Em nabêjin tenê bi saya vê guherînê kêşeya kurd wê bê çareserkirin. Wek mînak hin kes dibêjin, di vê guherînê de bo kurdan çi heye? Tiştek tuneye. Lê divê ji van kesan bê pirsîn, ger “Na” derkeve kurd wê sudê jê bigrin? Ger bêjin “Erê” ihtimaleke bi vî awayî heye, lê em bêjin “Na” wê ihtimaleke çawa derkeve? Em vê dibêjin: ger sîstema wesayetê bi paş ve bê xistin, ev ihtimal wê xurt bibe û di vê rewşê de ger sîyaset bixwaze vê bikaribe hêsantir vê kêşeyê çareser bike. Ev sedemeke têra xwe maqûl e ku kurd bêjin “Erê.”

Ger pêvajoya çareserîyê dest pê bike, wê daxwazên we çi bin?

Dive ev liser bê axaftin. Yanê di tûrikê kê de çi hebe deynê holê û bi awayekî zelal bipeyive. Çareserî şert e. Ger Tirkîye vê kêşeyê çareser neke wê qet nikaribe rihet tevbigere. Hukimetê jî ev baş fam kirîye. Lê çare çi ye, di vir de herkes fikrek xwe heye. Hêj di destpêka rê de divîyabû herkes gotina xwe bêje. Ya duyem, lazim e hûn kêşeya kurd, daxwazên rewa yên kurdan, mafên wan nekin rehînê çeka PKKê. Xaleke din jî, divê hûn liser mafên gelê kurd bazarê nekin. Ma hûn bazara çi dikin? Madem mafê rewa ye, hûnê vî mafî bidin.

Ger nîyeta we çareserkirina vê kêşeyê hebe, lazim e hûn çendîn listeyan çêbikin û dîyar bikin; piştî we daxwazên kurdan dîyar kir, hûnê vê bêjin:

1-Ev û ev mafên rewa yên kurda ne û heta îro dest hatîye danîn ser wan, em van li wan vedigerînin.

2-Ev û ev jî mafên wan in, lê jibo em daxwazên wan bi cî bînin, dem lazim e. Înşale em ê amadekarîya pêwîst bikin bo van û êm ê çareser bikin.

3-Ev û ev daxwaz wek maf nikare bên xwestin, em ê van nedin.

Belê, van eşkere bikin, em bibînin ka hûn çi difikirin. Werin em bi hev re liser van nîqaş bikin. Ez bawer dikim wê di demeke nêz de, mafên rewa yên kurdan belkî ji sedî 70-80ê wan bên bicîkirin.

Heta îro dikarin bêjin “Me xwest em çareser bikin hakim û polîsên FETOyê ji me re dibûn asteng ango sîstema wesayetê ya leşkerî dibû asteng.” Lê ger ji giştpirsîyê “Erê” derkeve, ew hencet wê ji destê hukimetê derkeve. Ewçax êdî em dikarin vê bêjin, “Pêşîya te hat paqij kirin, rêya te vebû. Ka îradeya te çi ye, çiqas e em bibînin. Tu yê vê meseleye çareser bikî an na?” Vê carê em ê hêsantir bikaribin hesab bipirsin. Ger bi hukimetê re ev îrade hebe, bawer dikim wê çareserî hêsantir be, lê ger wê mafên gelê kurd ji çekên PKKyê re rehîn bihêle û bi wan ve girê bide, ewçax ez dibêjim em ê bikaribin vê bêjin: “Di destê min de çek tuneye, lê ez mafê perwerdeyê yê bi zimanê dayikê dixwazim. Li hemberî vê daxwaza min tu çima dibêjî heta PKK dest ji çekê bernede ez mafê te nadim? Di destê min de çek tuneye ku vê liser min ferz bikî.”

HOŞENG OSÊ

PKK û “benîştê” yekîtîya neteweyî

> Di encamê de û li gorî rewş û rojev û dîroka PKKê, ev partî tenê bang û daxwazên yekîtîya neteweyî êdî weke “benîşt” bi kar tîne û hina gelek kesên reben hene ji qirçeqirça vî “benîştî” bawer dikin.

Rojek derbas nabe ku PKK yan jî berpirsekî vê partîyê daxwûyanîyekê derdixe û banga yekîtîya neteweyî li partî û rêxistinên kurdan dike. Dema mirov li van bang û daxûyanîyan dinere, hestek li cem mirov peyda dibe ku êdî tenê PKK bûye bav û dîya yekîtîya neteweyî ya kurdan û hemû rêxistinên din yên kurdan tev li dijî vê yekîtîyê ne!. Lê dema mirov li rojev û dîroka PKKê vedigere, baş têdigihêje bê heta çi radeyê bi navê banga “yekîtîya neteweyî” PKKê zîyan gihandîye doza kurd û Kurdistanê.

“PDK destekê dide dijminatîya kurdan” ev “şirove” di ajansa nûçeyan a firatê ANFê de ku ya PKKê, di roja 26/2/2017an de hatîye weşandin. (http://anfkurdi.com/rojane/pdk-desteke-dide-dijminatîya-kurdan). Çîye? Ne çîye?! Çima Serokê Herêma Kurdistanê M. Barzanî diçe Tirkîyê?! Jiber ku dewleta Tirkîyê û AKPê zilm û zordarî liser gelê kurd dimeşîne. Ev jî rast e. Lê van camêran zû ji bîr dikin ku berî 2 salan serokê PYDê Salih Muslim, du caran hate Tirkîyê û bi MITê re rûnişt. Wê çaxê jî dewleta tirk û AKPê çewisandin û zilm liser kurdan û HDPê dikir! Li gorî nirxandina ANFê dêmek serokê PYDê jî destekê dide AKPê dema qebûl kir were Tirkîye. Ji wisa zêdetir û dûrtir, Ocalan nêzîkî 20 salan di himbêza rêjîma Hafiz Esed (BAAS) de ma. Qey wê çaxê H. Esed bav û brayê kurdan bû!? Qey rêjîma BAAS zilm û zordarî liser 3 milyon kurd nedikir!? Ne tenê wisa jî, Ocalan hingî pesnê H. Esed dida, hindik mabû helbestan liser qencî û başî û qehremanîya Esed binivîsîne!

Li gorî dîroka vê rêxistinê, PKKê hîna berî ku xwe bi şêweyeke fermî di kongreya xwe ya 1ê de sala 1978an bi naskirin, şerê êl û eşîrên kurdan li Hîlwan û Sîweregê kir. Wê çaxê M. Karasungur berpirsê leşkerî yê PKKê bû. Piştre di salên 1979-1980 PKKê şerê partî û rêxistinên kurdan kir, mîna (DDKD) û (KUK). Her wiha mirov dikare bêje ku derba 12ê Eylûlê şerê di navbera PKKê û partîyên din yên kurdan bi dawî anî û eger ne ev derbeya bûya dibe ku PKKê koka partîyên din bianîya.

Rojnameya fermî û navendî ya PKKê “Serxwebûn” di rûpela 16an ji hijmara 20, tebaxa 1983an de xal û bendên peymana ku di navbera PKKê û PDK de hatibû morkirin, belavkirîye. Ew peymana ku ji 11 xalan pêktê, ji alîyê serokên herdû partîya A. Ocalan û M. Barzanî ve hatîye morkirin. Di peymanê de gelek xalên girîng û xweş û baş ku xizmeta yekîtîya netewî dikin hene. Lê xalên herî balkêş ev in:

7 - Rizgarîya neteweya Kurdistan, li her beşî bi hêzên gelê wî beşî bête rêvebirin....

8 - Bi binaxeyî her rêxiraw, partî, xebatê li beşê xwe rêve bibe, li beşên din komek û hêzên bi xwe ve girêday çêneke, belê bîr û bawerîya hevkarîyê û tufaqê bi xurtî li nav hêzên rizgarîya netewî li her beşî bê xwestin...

9 - Têkoşîna îdeolojîk ku di navbera wan partî û rêxrawên de ku li Kurdistanê hene tê kirin , divê ne bi terzekî ku peywendîyên wan têk bidin û nekevin xizmeta dijmin. Divê em bîrûbawerîyên rizagrîya netewî bi vê yekê girêdin û gîr û griftên ku di nav rêxrawan de hene, yan jî nû derdikevin divê ne bi çek, bi giftugo rakin...

10 - Destdirêjî nebin di karê rêxrawan de. Divê layangirên wan karan nebin ku zîyanê bigihîne yekîtîya partîyan, rûmet û rêzgirtina serxwebûna îdeolojîk, polîtîk.. divê were girtin.

11 - Di kiryara pêkanîna van dîtin û bendên ku li jorî me dîyarkirin, eger şaştî û xeletî rûdan, divêt berpirsên herdû alîyan hev agahdar û hişyar bikin, û eger agahdarî û hişyarî berçav neyê girtin, hingî her yek di xebata xwe de serbest û azad e.

Dema mirov têkilîyên di vanbera PKKê û PDKê de ji sala 1983an ta 1992an binirxîne, helbet dê bizane ka bê kî û ta çi radeyê peymana di navbera herdû partîyan de binpê kirîye.

Di kongreya xwe ya 4an, sala 1990î de PKKê biryara hukûmeta şer li “Botan-Behdînan” stend û ji vê biryarê re gelek propagede kir. Ango PKKê herêma Bahdînan ku beşeke ji başûrê Kurdistanê ye, weke herêma şer girêdayî xwe îlankir!

Di sala 1991ê de, PKKê li Başûr partîyeke girêdayî xwe ku navê wê Partîya Azadîya Kurdistan - PAK demezrand. Di sala 1994an de PAK bû Yekîtîya Neteweyîya Demokratîk a Kurdistanê YNDK. Ev partî perçe bû. Piştre PKKê, partîyeke nû girêdayî xwe bi navê Partîya çareserîya demokratîk yan Kurdistan - PÇDK çêkir ku niha bi şêweyeke fermî li Kurdisan û Iraqê kar dike.

Tim hêzên PKKê li Başûr 10 qatî hêzên PKKê ku li Bakur in. Baş tê zanîn ku herêmên Qendîl, Heftanîn, Xwakurk, Metîna, Garê..., û niha jî navber 1500 heta 2000 şervanên PKKê li herêma Şengal û Mexmûr hene. Ev tê çi wateyê? Tê wateya ku PKK dike Kurdistana Federel ya Iraqê têxe bin destê xwe.

Ev jî rast e ku PDK di payiza 1992an de digel artêşa Tirkîyê şerê PKKê kir û PDKê û M. Barzanî gelek caran rexneyên tund li rewşa reş kir û sozda ku ew rûpelên reş dubare nebe.

Baş e yabo, dema PKKê bi roj û şev û bi vê dilgermîyê û dilsozîyê bangên yekîtîya netewî dike çima şerê “dewleta neteweyî” dike!? Ango, li ser vê yekîtîya neteweyî ma PKKê dê çi ava bike? Eger ne dewleteke neteweyî be dê çi be!? Dê “xweserîya demokratîk” be, gelo? yan jî dê “konferderalîsma demokratîk a Rojhiltata Navîn” be?! Bi gotineke din; çawa PKKê digel yekîtîya neteweyî ye û li dij dewleta neteweyî ye!? Çawa PKKê banga yekîtîya neteweyî dike û di eynî demê de, li dij bîrûboçûnên netewî ye û bîrdozîya netewayî weke tişteke şûndemayî û kevneperest dibîne!?

Di encamê de û li gorî rewş û rojev û dîroka PKKê, ev partî tenê bang û daxwazên yekîtîya neteweyî êdî weke “benîşt” bi kar tîne û hina gelek kesên reben hene ji qirçeqirça vî “benîştî” bawer dikin.

MURAD CIWAN

Sê alîyên referandumê

Ya maqûl ew bû ku tenê alîyekî referanduma 16ê nîsanê hebûya, lê jiber rewşa sîyasî, bi kêmasî sê aliyên wê bi kartêkirinên xwe yên giring derketine pêş. Alîyê destûrî, yê berberekîya sîyasî yê konjuktura heyî û yê pirsa kurdan.

Ez dixwazim li ser van her sê alîyan rawestim.

Alîyê destûrî ew e ku destûra serwer a encama darbeya eskerî ya 12ê Eylula 1980yî, heta nuha çend caran hin madeyên wê hatine guhertin jî ew sererast nebûye, yeka demokrat derneketîye ku hemî pêkhateyên Tirkîyeyê li serê lihevkirî bin.

Nuha di 18 madeyên wê de guhertin hatine kirin ku bingehekî sîstemeka serokatîyê ya bi awayekî tîne. Ya rast ew bû ku destûra kevn û ev 18 maddeyên parlamentoyê pesendkirî, bihatana hemberkirin û minaqeşekirin. Gelo destûra berê çawa ye, madeyên nuh çi guhertinan tînin, guhertin ê bibin pêşveçûna ber bi demokrasîyeka azad ya pirpêkhateyîyê, yan ê maf û azadîyên heyî tengavtir bikin li gor ya berî xwe?

Heta, divîya partîyên sîyasî yên desthilatê û mixalefetê, bi hev re mihawele bikirana da minaqeşe li ser vî esasî bimeşin, pirsgirêkên ku rasterast bi vê ve nebestî ne, nekevin pêşîya minaqeşeyên liser destûrê. Çimkî encama vê referandumê, 'erê' jî, 'na' jî be, hukumeta heyî ê neguhere, biryareka çareserkirina pirsa kurdan ê pesend nebe, destur ê biguhere.

Lê ji ber noyî û reqîya hevrikîya sîyasî-civakî, heta ya yên li pişt wan ên hundur û derva, ên wesayetgêrî ên dewleta kûr û ya diyar, qonaxa referandumê ji bingehê xwe yê rasyonel ê liser destûrê û guhertinên nuh bi dûr ketiye, buye navenda şerekî dijwar ê rikeberîya sîyasî. Buyerên konjukturê li ser fikr û biryaran kartêkir in.

Bivê nevê, diyardeya rikeberîya sîyasî derketîye pêşîya hemû alîyan. Tevî ku kurd alîyê sîyê ê vê referandumê ne û divîya ew ji war û perspektîfa xwe nêzî encamên referandumê bibûna jî, bi tesîra tirkan û hêza kurd a musellet, bûne parçeyeka duberekîya desthilat-dijberîyê; heta yedekên vî-wî alîyî. Mihaweleyên alternatîfa sêyem ya kurdan, gelek kiz, jar û kenarî mane. Ev mihawele, wek eleqenekirina li pirsgirêkên sîyasî yên Tirkîyeyê, yan şêla serxwebûnxwazîyê tên nîşandan.

Ev, ne rast e, kurd serxwebûnxwaz bin jî, otonomîan federasyonxwaz bin jî, lazim e îdî dev ji aktorî an destekdarîya vî-wî alîyê tirk berdin, bibin terefê sêyem ên îradeya xwe û bi vê rawestîyanê di sîyaseta navendî ya parlamentoyê û desthilatdarîyê de rolê bistînin. Hetta nuha, kurd bi vî-wî alîyê tirkan re dertên 'paleyîya' sîyasetê. Bi hev re diçînin û diçînin, lê berê keda wan diçe ser bêndera vî-wî alîyê tirkan. Eger bimîne, carina, tenê liqat û kozere ji kurdan re dimîne. Îdî divê berhema keda kurdan biçe ser bêndera wan bi xwe. Îcar li bazarê, kurd wek terefê sêyem xwedan mafê qasî yên din, li gel kê qenc dibînin, li gel wan rawestin. Mesela rawestîyana liser pîyên xwe bi îradeya xwe ya serbest, ne bes pirsa serxwebûnxwazan, ya hemû wan kesan e jî ku dixwazin li nav Tirkîyeya demokrat bijîn.

Em bên ser zelalkirina her sê alîyên referandumê:

Di warê destûrî de: diyar e, madeyên nuh, sîstemeka serokatîyê ya otoriter tînin. Rê nadin cudatî û hevsengîya hêzan; yên navbera hêza birêvebirîyê, ya yasadanînê ya li parlamentoyê û ya dadweriyê ya ku serbixweyî û bêterefîya hiqûqa welêt pê tê misogerkirin.

Lê ev nayê maneya deshilata takekesî. Takekesîya ku rengê xwe daye desthilata AKPê, hê berî guhertina madeyan, bi karizma û xirsa serokkomar Erdogan peyda bûye. Maddeyên nuh, muhtemelen ê yekdestîyê zêdetir neke, qanûnîtîyê bide rewşa de facto.

Guhertinên destûrê ji ya heyî xerabtir nekin. Destûra nuha, bi her awayî rê vedike jibo wesayetgêrîya hêzên nehilbijartî (burokrat) liser herduyên hilbijartî; hêza rêvebirîyê û organa yasadanînê, herwiha dadweriyê jî. Ew bingehê sîstema takehêzîya wesayetê ye.

Diktatorîya takekesî ya dewra kamelîzmê, yekdestîya tek-partîtîyê, sê-çar darbeyên eskerî yên piştî 60ê, xwe spartin van destûran. Di qonaxên navbera darbeyan de, wesayeta li ser hukumet û parlamentoyê ya eskeran, dadwerên bilind, dewleta kûr hwd. Hemî taybetmendîyên sîstema parlamenterîya hata nuha ne.

Sîstema serokatîyê, desthilatê ji tehdîda nav lepên wesayetê bêtir dipar êze, sîstema du-sê partîyên xurt dixe parlamentoyê ku ew karin li hember wesayeta nehilbijartî li ber xwe bidin. Di sîstema nuh de, otoriterîyeka biçe heta dereceya otokrasîyê jî, dibe teseluta serokekî hilbijartî yê heta demekê. Dîtin, eşkerekirin, têkoşan û rakirina vê teselutê, asantir e ji ya wesayeta veşartî ya paxavnekir ji hilbijartinan, ya ku kî bê jî ew her desthilat e.

***

Cih vê hefteyê nema, zelalkirina herdu aliyên din; rikeberiya siyasî û aliye kurdan di hefteya bê de…

Nûnerên Partîyên Bakur:
Em şanazîyê bi Barzanî dikin

NÛJÎN ONEN

DENGVEDANA serdana Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî bo Tirkîyê berdewam dike. Nûnerên partîyên sîyasî bo heftenamya Basê eşkere dikin di civînên Barzanî yên bi serokwezîr, serokkomar û Ahmet Türk û Sırrı Sakık proseya çareserîya rewşa kurdan hatîye gotûbêj kirin. Herwiha tekezîyê liser wê yekê dikin ku Barzanî aktorekê giring e li Rojhilata Navîn û ew şanazîyê bi dîplomasîya wî dikin.

Serokê PAKê Mustafa Özçelik: Bo çareserîyê divê şer raweste

Serdana Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî berîya hertiştî êdî kurd xwe bielimîne vê yekê ku wek serokê dewletekê tê dewletek din zîyaret dike. Mesûd Barzanî ji aliyê hemu dewletên cîhanê wek serokê dewletekê tê qebulkirin. Ligor me hatina wî ye Tirkîye û ew şêweyê pêşwazîkirina dewleta Tirkîyê jî esas wek muameleya serokê dewletekê tê kirin. Divê berî dewletên cîhanê kurd bixwe qebûl bikin êdî li gor wê meselê binirxînin. Mesela pêvajoya çareserîyê tê behskirin,daxwaza serbestberdana Selehaddin Demirtaş û sîyasetmedarên din berîya hertiştî ev daxwazek însanî ye. Heta ku şer raneweste Serokê Herêma Kurdistanê dê nikaribe liser masê ligel Tirkîye bi awayekê xurt bide û bistîne. Divê PKKe jî şer rawestîne e,heta şer raneweste ne Mesûd Barzanî ne alîyên kurda ti kesî xurt nabe. Divê hemû partîyên kurdan muxatabê wê meseleyê bin,piştî şer rawestîya hemû partîyê kurdan liser bernameyek neteweyî û hevbeş lihev bikin û li hemberî dewletê bêjin tu jî şerê xwe rawestîne were em rûnîn. Kî bi çi awayî kîjan alî vî şerî bisekinî ne em ê piştgirîya wan bikin.

Cihgirê PSKê Bayram Bozyel: Rola Mesûd Barzanî girîng e

Tirkîye jî û Herêma Kurdistanê di Rojhilata Navîn du aktorên girîng in. Pirsgirêkên wan yê muşterek hene wekî aramîya Rojhilata Navîn,şerê li hember DAIŞê rizgarkirina Mûsil û Raqqa yê ev herdu alîyan jî eleqedar dikin. Herwiha pirsên Tirkîye yê navxweyî jî û yê Kurdistanê navxweyî jî herdu alîyan eleqadar dikin. Wekî nimûne şer û pevçûn ev çend sal e li Kurdistanê û Tirkîye didome meseleya serxwebûnê îro li pêşîya Herêma Kurdistanê ye. Tirkîye Herêma Kurdistanê wekî aktorekê girîng dibîne pêwendîyên wê liser vê asasê birêve diçin. Mesela çareserîyek nû mirov nikare tiştekî bibêje li ev tiştekê berbiçav e ku Tirkîye sîyasete tundîyê sîyaseta liser şer heta dawîyê nikare bimeşîne. Berê jî 30 salan ev metod ceribandin lê negîhiştin encamê xuya ye îro pê ve jî nikare bigihêje encamê. Tirkîye wê carek edin vegere ser meseleya hevdîtin û dîyalogê.

Serokê HAKPARê Refik Karakoç: Em şanazîyê bi Barzanî dikin

Serdena Serok Barzanî ya Tirkîyê girîng e,Serokkomar û Serokwezîrê Tirkîye Mesûd Barzanî wekî serokê dewleteka serbixwe pêşwazî kir. Jibo gelê me,jibo başurê Kurdistanê girîng e em pê şanaz bûn. Piranî di rojeve wan da berî hertiştî şerê Mûsilê hat holê ser wî minaqaşekirin piştre aborîya herdu alîyan jî hatîye axaftin. Serok Barzanî wexta cara yekem di navbera PKKê û dewlete Tirkîye yê de jibo aştîyê rola wî hebû û rola wî mezin e lêbelê pêvajoya çareserîyê nemeşîya. Tê gotin jibo rawestandina şer xebatek heye,rolek jî ya Serok Barzanîye liser kurdên Tirkîye bandora wî heye. Salên dawî navbera hikumeta Tirkîye û ya wan jî baş in. Em dixwazin roj berî rojekê şerê çekdarî bisekine rêya sîyasetê vebe. Şerê herî mezin jî dawîya wê aştîye. Îro şûn ve proseya nû destpê bike bila xeletîyê neke tenê PKKe û HDPê an jî tenê rûnenin divê em partîyên kurdan din av vê proseyê de bin.

Serokê ÖSPê Sinan Çiftyürek: Bilindbûna Ala Kurdistanê serkeftinê

Bilindkirina Ala Kurdistanê ji alîyê me serkeftinek e lê ji alîyê AKPê wek gûmanek e mehek din referandum wek navbera gelê kurd re hişmendîyek pêk bîne. AKPe îro bi MHPê re îttîfaq kirîye lê cardin jî Ala Kurdistanê li balafirgehên xwe bilindkirîye ji bo sîstema serokatîyê here serî dixwaze fikr û raman bide ber gelê kurd acaba ez dikarim erêkirinê zêde bikim navbera gelê kurd de divê em vê jî zanibin. Li gor min proseya çareserîyê ne di rojevê de ye,Tirkîye jî îro vê qebûl nake Serok Barzanî helwesta xwe dîyar kir got em dixwazin hevserokê HDPê Selehattin Demirtaş û yên din bên berdan ew peyamek e baş bû. Lêbelê yek bi yek mesele çareserkirinê gotubêj bikin jî ez ne bawerim Tirkîye di vê merheleyê de ne û naxwaze.

Berpirsê Tevgera Azadî Sedat Doğan: Mîsyoneka gring a Barzanî heye

Îro di Rojhilata Navîn de navê kurda û hiqûqê kurdan bi awayekê fermî nav hiquqa dewletên navneteweyî nehatîye holê. Serok Barzanî îro mîsyonek wiha liser wî ye ji bo ku serokê dewleta xwe ye ji kurda re jî dibe wekî hêvîyakê. Dibe Serok Barzanî çareserkirina pirsa kurd rolekê bilîze û bêlistin baş e jî. Şerê nav Tirkîye heta dawîyê nadome em ji dîrokê jî dizanin û di jîyana xwe de jî dizanin du şerê gelekî mezin yê şerê cîhanî çêbûye lê encam wê aştî bûye di dawîyê de her alî liser maseyê rûniştîye. Ji mirov û dewletan re jî ya herî baş ev e şer birînên wê zêde kûr nebe divê roj berî rojekê ber bi aştîyê ve here. Ev şer heta dawî bidome ne fêda kurdan jê heye ne jî ya dewletê jê heye.

Serokê PDK Bakur: Sertaç Bucak: Cenabê serok bo aştîyê hat Tirkîyê

Hatina Serok Barzanî him jibo welatê me him jî bo kurdan girîng e bi her hatina wî tiştên baş yê sîyasî çê dibe. Bilindkirina Ala Kurdistanê ya li balafirgeha Stenbol û Enqerê di navbeyna sîyaset û pêwendîyên Hikumeta Tirkîye normalîze bûye û pêş ve çûye ligor rêbazên dîplomasîyê ev normal e. Serok Barzanî daxwaz kiribû ku Selehaddin Demirtaş an jî endamên partîya HDPê bên berdan ev daxwazeka gelekî normal e û jibo normalîzebûna sîyaseta Tirkîye jî tiştekê girîng e. Ez bawerim cenabe serok jibo çareserkirina pirsa kurdî bi awayekê sîyasî û aştîyan e hertim daxwaz kirîye û pêwendîyê wî yê ligel Tirkîye jibo qezanca demokrasîyê jibo meseleya kurd gelekî girîng e. Di destpêkirina proseya aştîyê ya berê jî Serok Barzanî gelek caran rolek pozîtîf lîstîye û daxwaza wî jî ev e lê tiştên muhîm ev e ku alîyên proseyê amadebin ege yek alî amade nebe zehmet e lê wekî sîyaset Serok Mesûd Barzanî hertim liser vê meseleyê de rolek pozîtîf lîstîye.

Serokê PDKTê Mehmet Emin Kardaş: Di seredanê de gelek mesele hatine axaftin

Tirkîye û Herêma Kurdistanê di hidûdê hevdu de ne û cîranên hev in kurd li beşekê mezin ê Tirkîye yê dijî jiber wê serdana Serok Barzanî ya Tirkîye yê gelekî girîng e. Bi asteka bilind jî hate pêşwazî kirin. Ez di vê bawerîyê de me ku hevdîtinên bi serokwezîr û serokkomarê Tirkîye hatîye kirin ji kêşeyên navxweyî bêhtir kêşeya dewletbûyînê,serxwebûn hatîye rojevê û meseleyên Başîka,Mûsil,Iraq,Kerkûk bi giştî liser meseleyên Rojhilata Navîn guftugo hatîye kirin. Ala Kurdistanê ji xeynî liser maseyan li balafiran jî hatibe bilindkirin ev tê wateya ku Tirkîye êdî ji dewleta serbixwe amade ye. Kêşeya navbera dewletê û PKKê de ya çekdarî bi rêya aştîyane bi dawî bibe Barzanî herdem ji vê re amade ye. Serok Barzanî mîsogerîyekê wernegire carek din nakeve vê pêvajoyê. Barzanî ji zu ve dixwaze ev pirsgirêka çareser bibe ne ji bo Tirkîye,jibo van xortên kurdan yê ku bêwate û bêarmanc têne kuştin û pêşîya wê bê girtin.

Bayram Bozyel

Mehmet Emin Kardaş

Refîk Karakoç

Sertaç Bucak

Qeyrana Sûrîyê:

Menbîc bûye girêka nû

Şerê navxweyî yê Sûrîyê berdewam dike. Hêzên herêmî û aktorên navxweyî yên Sûrîyê û dewletên weke Rûsya û Amerîkayê jî niha li Menbîcê ne. Artêşa Azad û Tirkiye piştî girtina Babê berê xwe dane Menbîcê, herwiha rejim jî hêzên xwe ber bi Menbîcê dişîne û alîkarîya YPGê û HSDê dike.

DERYA KILIÇ

Şerê navxweyî yê Sûrîyê germ bûye û lhefteyeke li bajarê Menbîcê asê bûye. Piştî paqijbûna DAIŞê li bakurê Helebê û serkeftinên rejimê, hewldanên Artêşa Azad û Artêşa Tirkîyê yên rizgarkirina Babê, hewla rejimê û YPGê ya vekirina korîdoreke di navbera Kobanî û Efrînê dibe hokar ku hemû hêzên leşkerî li dijî hevdû rawestin. Ligor zanyarîyan hêzên HSD, YPG, Sûrîye, Artêşa Azad, Tirkîye, Amerîka, Rûsya ketine menzîlên topxaneyên hevdu. Menbîc heta meha Tebaxa 2016an di destê DAIŞê de bû. Lê Hêzên Sûriyê Demokratîk bi piştevaniya hêzên hevpeymaniya dijî DAIŞê di Tebaxa 2016an de parêzgeha Menbîcê ji destê DAIŞê derxist û li wê derê Meclîsa Leşkeriya Menbîcê damezrand. Bi rizgarbûna Menbîcê re Tirkiye piştevanî da Artêşa Azad û li Tebaxa 2016an de li bajarokê Cerablûsê yê Sûriyê dest bi operasyonê kir. Tirkiyê jî meha Tebaxê diyar dike ku dê biçe Menbîcê û YPGê ji wê derê derxine.

Geşedanên ser erdê didin xuyakirin ku dê hevsengîyên şer biguherin lewre hêzên Sûriyê gihiştine Menbîcê û cihê ku di destê HSDê de ye ji HSDê distîne û HSD ji wan herêman vedikşe. Ev jî dibe sedem ku alîyê Menbicê rejim û hêzên Tirkiyê bên beramber hev û şerê hev bikin. Herwiha hin çavkanîyên herêmî balê dikşînin ser wê yekê ku şer di navbera rejimê û Tirkiyê jî de

Weke ku dihêt zanîn rejima Sûriyê di meha Sibatê de li Babê rêya DAIŞê ya bi Reqqayê qût kir. Di heman demê de Tirkiyê û Artêşa Azad jî li bakurê Babê li dijî DAIŞê kirin. Hefteya borî rûdanakê girîng pêk hat û Artêşa Tirkiyê di 23 Sibatê de ragihand ku ketine navenda Babê bi tevahî hatiye kontrol kirin.

Ligor SputnikNewsê jî DYAyê jiber ihtimala êrişa Tirkiyê li Menbîcê baregah saz kir û leşkerên xwe şandin wê derê. Ji aliyên din vê heftenameya Basê di hefteyên borî de ragihandibû ku YPG û HSDê jibo ihtimala êrişeka Tirkiyê amedekariyê dike. Rejima Sûriyê jî bi alîkariya Rûsyayê re Taifê bi dest xist û ber bî aliyê Menbîcê ve çû. Dema ku rejim ew der bi dest xist, jibo Reqqayê Menbîc dimîne. Artêşa Tirkiyê û Artêşa Azad roja çarşemî êrişî Menbîcê kirin û 2 gund ji HSDê standin. Lê hêzên rejim jî li wê derê cih digrin. Ji aliyê din vê Meclîsa Leşkeriya Menbîcê ragihand ku rojavayê Menbîcê radestî rejimê kirine û ev bi navbeykariya Rûsyayê pêk hatiye. Herwiha ligor pisporan ev bûyera îdiaya hevalbendiya rejim û PYDê quwettir dike.

Ji aliyê din vê bi vî awayî li Menbîcê hem hêzên herêmê û hem dewletên zilhêz berê çekan lihev rast kirine. Jiber ku Amerîka YPG aliyekê sekînine û Rûsya û rejim li aliyekî. PYD û rejim bi hev re tevdigerin û li hemberî wan jî Artêşa Azad û Tirkiyê heye. Ligor çavkaniyan Tirkiyê dê nikaribe biçe Menbîcê. Çimkî jibo wê ev gelekî xeter e û Tirkiyê naxwaze DYA û Rûsyayê li dijî wê rawest in. Ji aliyê din vê ligor nûçeya Tirkiyê li Azez û li Babê Artêşa xwe bihêz dike. Erdoğan û Wezirê Derve yê Mevlüt Çavuşoğlu axivîn û diyar kirin ku dê biçin Menbîcê. DYA û Rûsya derbarê Menbîc û rûdanên vê de ti tişt negotin. HSDê diyar kir ku ew dê ji Menbîcê dernekevin.

Herwiha ligor pisporan dê şerekî mezin rû bide israra alîyan a liser Menbîc jî jibo vê weke amedekari ye.

Trum dê çi bike?

Dema ku Serokê Nû yê DYAyê Donald Trump dest bi kar kir, hemû cîhan li benda politîkayên wî yên derve yê sekinî. Dewleten weke Tirkiyê, Rûsya û Îran herî zêde li benda polîtîkayên wî yên Sûriye ne. Wezîrê Berevaniyê DYAyê James Mattis di 27ê Sibatê 2017an de dosyaya plana têkoşîna lidijî DAIŞê pêşkêşî Trump kir. Ligor pisporan piştî vê dosyayê dê polîkîkayên DYAyê zelal bibin. Lê Donald Trump hîn jî ti tişt nabêje. Serokê CENTCOMê Fermandar Joseph Votel di Sibata 2014an de li Menbîcê got: "Jiber ku YPG xwediyê tecrûbe ye, divêt beşdarî operasyona Reqqayê bibe."

Fermandarê DYAyê li Iraqê Stephen Towsend jî derbarê vê de axivî û diyar kir ku jibo beşdarbûna Tirkiyê ya operasyona Reqqayê bi Enqereyê re hevdîtinan pêk tînin. Lê hêzên kurd bi awayekî din di operasyonê de cih bigirin. Ev hemû nêrinên Pentagon û aliyê leşkerî nişan didin. Jiber vê jî dihêt texmin kirin ku di pêşnimaya ku ji aliyê Pentagon hatiye amede kirin û pêşkeşî Trump hatiye kirin de, dibe ku DYA leşkerên xwe bişîne ku Towsend jî di axaftina xwe de zêde zanyariyan nede jî ihtimala vê jî anibû ziman. Lê tiştekî herî girîng ev e ku DYA jibo Reqqayê bi YPGê re tevbigere yan Tirkiyê-Arteşa Azad. Ligor pisporan DYA dê YPGê hilbijêrine.

Herwiha jiber rûdanên dawiyê Reqqa paş ketiye. Lê HSD ji 3 aliyan nêzikê Reqqayê dibin û rejim û Rûsya jî ber bi Reqqayê diçin.

Akademisyenê Zanîngeha TOBBê Nihat Ali Özcan, Rojnameger Mustafa Kemal Erdemol û Kemal Şêxo rûdanên dawiyên li Sûriyê û Rojavayê ji heftenameya Basê re nirxandin.

Akademisyenê Zanîngeha TOBBê Ali Nihat Özcan: Bûyerên mezin dê piştî Menbîcê biqewimin

Özcan rûdana Menbîcê nirxand û rave kir ku Menbîc tenê sembolîk e. Jiber ku bûyerên mezin dê piştî Menbîcê biqewimin. Jiber vê ev hîn destpêk e û hemû kes liser vê niqaşan dikin. Piştî Menbîcê dê hemû kes alî û pozîsyonên xwe diyar bikin. Divêt bersiva DYAyê bihêt dîtin. Weke hûn dizanin DYA hîn jî polîtîkayên xwe yên Sûriyê û planên xwe yên Reqqayê aşkere nekiriye. Hemû alî hewl didin ku liser Menbîcê bandor liser hev du bikin. Heta ku DYA planên xwe aşkere neke dê vê rewşa berdewam bike.

Rojnameger Erdemol: Artêşa Azad û Tirkiyê dê li Menbîcê nemînin

Erdomol hewla Tirkîyê ya jibo Reqqayê nirxand û diyar kir ku Tirkiyê dê beşdarî operasyona Reqqayê nebe. Lê Amerîka jibo dilê wê bigre, dê hin tiştan bike. Bo mînak li hin cihan hêza PYDê kêm bike. Têkiliya Tirkiyê bi Reqqayê re tine. Rojnameger Erdemol bal kişand ser tirsa Tirkiyê û axaftina xwe wisa domand: "PYD car caran bi Artêşa Sûriyê re hevalbendiyê dike. Heger Tirkiyê tevî ev hemû tiştan biçe Menbîcê dê bi kêşeyên mezin re rûbirû bihêt. Tiştên ku ji rayagiştî re dihêt gotin, çi qas rastin? Em dê demeka nêzik de hîn bibin. Bo mînak rastiya gotinên wan yên derbarê Babê de piştî operasyonê diyar bû û em fêrî rastiyê bûn."

Kemal Erdemol di dawiya axaftina xwe de liser hevalbendiya PYD û rejimê de rawestiya û rave kir di navbera PYD û rejimê de hebalbendî heye û dê rejim destûr bide PYDê ku kantonan bigehinin hev du. Lê nizanim tekez bigehêjin hev du yan na. Tekez hêzên kurd li wê derê mayinde ne. Rejima Sûriyê jî liser vê mijarê qaneh bûye. Ji aliyê din vê hevalbendiya PYD û rejim bê mentiq nîn e. Ev rêyaka çereseriyê ye. Jibo çareserkirina kêşe kurd ya li Sûriyê jî rêbazeka baş e. Herwiha PYD û rejim di warê erdnigariyê de hevalbendên stratejîk in. Rûsya jî di nav vê blokê de ye. Tirkiyê jî nikare lidijî vê raweste.

Rojnameger Şêxo: HSDê hin herêm dane rejimê

Rojnameger Kemal Şêxo da zanîn ku Amerîka YPGê wke hevpeymanê xwe dibîne û wiha axivî: Amerîka duh jî û îro jî got hevalbendê me yê li erde şer dikin. Em qebûl nakin êrîş bên ser wan. Piştî Babê sînor hatin guhertin. Yê Menbîcê û Heleb hat guhertin. Dê Rakkayê jî biguhere. Tirkiyê kurdan naxwaze, kurd jî Tirkiyê naxwazin. Rejim û Rûsya jî dixwaze bakurê Helebê têxin bin kontrola xwe. Amerîka jî piştevaniya HSDê dike. Niha vê qelebalixa li Menbîcê çê bûye, gelekî xeter e."

Kemal Şexo herwiha ragihand HSD jiber şer zêde giran nebe û Tirkiyê êrişî wan neke, hin herêm dan rejimê. Tel Aref jî yek ji wan herêma ye. Rejimê niha rêya Tirkiyê û Artêşa Azadê qût kir. Xwe ji wan kişandin. Tirkiyê nikare şerê Menbîcê bidomine. Jiber ku rejim kontrola wan derana bi dest xist û pêş vê diçe.

MUSA KAVAL

Arêşeyên Rojhilata Navîn û paşeroja kurdan

Serok Mesud Barzanî biryar daye ku ji niho û paşve şerê birakujîyê di nav kurdan de, nête kirin û rijandina xuna kurdan bi destên kurdan heram e.

Ji ber pir sebeban, nexasime sebebên jeosîyasî, jeostratejî, aborî, dînî û tîcarî, herêma Rojhilata Navîn di midehên dîrokî yên kevn de heta niho her cihê îhtimama dewlet û hêzên mezin yên bîyanî bû. Di paşerojê de jî, gringîya vê herêmê dê her berdewam be. Ji ber ve yekê, dijberî di navbera berjewendîyên dewletên mezin de heye, ew nahêle ku tifaqên berdewam di navbera aktorên sereke yên cuda de misoger bibe. Ji alîyekê din ve dewletên herêmê jî zû bi zû li hev nakin. Ne dûr e ku Rojhilata Navîn careka din û bo demeka dirêj bibe cîyê çirbezirkanê (milmilanê) û dubendîyê di navbera dewletên mezin de.

Du hêzên cihanî li Rojhilata Navîn

Evro herdu xurttirîn hêzên di cihanî de, anko Dewletên Yekgirtî yên Amrîkî û Komara Rûsya ya federal, di pir waran de jibo desteserkirina Rojhilata Navîn dixebitin. Milmilane di navbera wan de, di pir astan de berdewam e, nexasime liser asta leşkerî, sîyasî û dîplomasî. Her yek dixwaze ku roleka sereke di paşeroja vê herême de hebe û heryek hewl dide ku ji nû ve nexşa wê ya sîyasî û cografî gora berjewendîyên xwe dane. Bi serokatîya van herdu dewletan, duserî, duhevbendî di navbera dewletên vê herêmê de de peyda dibin. DYA serkeşêya terefekê diket û Rûsya serkêşîya terefê din.

Nexşa nû

Bûye dora pênc salan ku arîşeyên Rojhilata Navîn berdewam in û ne dûr e ku bo demek bidomin. Arêşe û nakokî roj li pêy rojê peyda dibin û çi pirsên sereke ne hatine çareser kirin. Bandor û tesîra wan dê tarîxeka nû biafirîn û dê şekil û rengekê nû bide nexşa sîyasî û paşeroja gelên vê herêmê. Guherandinên nû dê cewher û çemkeka nû bo peywendîyên sîyasî, jeopolîtîk û aborî biafrînin. Wa dîyar e ku rewşeka wesan peyda bûye ku liser bingehên tixûbên cografîyên kevn û terazû û hevsengên sîyasî yên berê çi çare bo van arîşeyan nikarin bêne dîtîn.

Pêwîstîya stratejîyeka hevbeş

Jiber ku Kurdistan û neteweyê kurd di merkeza Rojhilata Navîn de cih digire, gelê me û welatê me wekî herdem, dibin merkezê îhtîmama hêzên mezin. Tecribên dîrokî dîyar kirine ku her dema guherandinên mezin li herêmekê têne kirin û hêzên mezin dibin aktorên wan guherandinan, terefên lawaz dibin qurbanên planên dewletên mezin ku berjewendîyên xwe yên neteweyî liser tunekirina berjewendîyên wan diafrînin.

Mixabin ev yeke pircaran bi serê gelê kurd hatîye. Eger kurd hêza xwe nekin yek û bi hest û projeyên netewî hereket nekin, dibe ku carek din bibin qurbanên berjewendîyên dewletên herêmê û yên hêzên navneteweyî. Di demên borî de, pir deliveyên mezin bo kurdan çêbûyine, lê mixabin aktorên sîyasî yên kurd ne karîbûn mifên gelê me û berjewendîyên wî biparêzin.

Digel vê yekê jî, di van salên dawî de, pêşketinek baş di zêhnîyeta aktorên sîyasî yên kurd de peyda bûye. Kêm zêde dîyalogek di navbera wan de heye. Yek ji baştirîn û gringtirîn pêşveçûyînan ewe ku Serok Mesud Barzanî biryar daye ku ji niho û paşve şerê birakujîyê di nav kurdan de, nête kirin û rijandina xuna kurdan bi destên kurdan heram e.

Ev biryareke ji giringtirîn pêşvecûyînan, di çanda sîyasî partîyên Kurdistanî de. Lê ev yeke bitinê arêşeyan careser naket, Lewma fere ku hemo hêz û partîyên sîyasî rêz û rumetêk mezin bidene vê yekê. Di gel vê yekê tiştek din pir giring, pêwîst û jindar heye, ew eve ye: Fere ku aktorên sîyasî yên kurdistanî stratîjîyek hevbeş biafirînin û gora vê stratejîyê berjewendîyên netewa kurd û kurdistanîyan biparêzin. Pêwist e û zerorîye ku mejîyek hevbeş yê giştî peyda bibît. Ev mejîyê hevbeş ê giştî bibîte rêber bo nexşa sîyaseta netewî li ser asta hundurî, herêmî û navnetewî. Hingê her partîyek li Kurdistanê, her kesayetîyek sîyasî, her sazîyek dê hêza xwe di çarçoveya bercewendîyên hevbeş yên gelê Kurdistanê de bikarbîne.

Rewşa Rojhilata Navîn hind aloze, giringîya wê bo cihanê hind mezine ku herweku em dibînin, mezintirîn hêzên cihanî û mezintirîn dewletên dunyayê, wekî Amerîka û Rûsya jî, ne şên biserê xwe tedbîrê lê bikin û digel wê sereder bibin. Her yek jibo xwe li hevalbendan dibîne, tifaqên sîyasî û stratejî digel wan dikin û bi harîkarîya wan pêngavan dihavêjin. Herwesan çi dewletên herêmî jî bi serê xwe neşên berjewendîyên xwe biparêzin necar dibin di gel dewletên din tifaqan pêk bînin.

Mixabin, di vê rewşa aloz û tevlîhev ya Rojhilata Navîn de û digel ku partî û hêzên sîyasîyên Kurdistanê terefê kêm hêzin jî, ew bi hevre sazgar nînin, Tiştê ji vê yekê hêj bi tehlîketir eve ku partî û hêzên kurdistanî dijhevîya hev dikin. Gelo di vê rewşa aloz û metirsidar de, eger partî û hêzên kurdistanî strateejîyek hevbeş û sîyasetek yekgirtî pêkve ne nekin dê çewan bikarin berjewendîyên gelê Kurdistanê û û mafên wî biparêzin?

JAN DOST

Zimanê kurdî yan zimanên kurdî?

Em gelek caran behsa zimanê kurdî yê standard dikin. Em kêfa xwe xweş dikin û mizgînê didin hev ku êdî zimanê me yê kurdî ber bi standardbûnê ve diçe. Lê gelo ev iddia heta kîjan astê rast e? û zimanê ku em behsa wî dikin kîjan e? gelo yê ku bi elifbêya (alfabeya) latînî û zaravayê kurmanciya jorîn (kurmanciya bakur) tê nivîsandin e yan jî zimanê ku bi elifbêya erebî (aramî) û zaravayê kurmanciya naverast (soranî) tê nivîsandin e! Yan jî tew dimilkî ye, yan behdînî ye?

Li vir rewşenbîrên kurd jî xwendevanên kurd jî tim dikevin xefka giştîkirinê (generalization) û ji xwe û persepktîva xwe de li (zimanê kurdî) dinêrin.

Her kurdek gava behsa zimanê kurdî dike, bêguman mebesta wî zimanê ku ew pê diaxive ye, bi elifbêya xwe, bi ferheng û peyvên xwe û bi berhemên ku pê hatî nivîsîn. Dema ku yek dibêje zimanê me, di hişê wî de tenê „zimanê wî“ ewê ku ew pê diaxive ye. Zimanê li aliyê din ne mebesta wî ye. Lê ji ber hizrên neteweperest û dûr ji nirxên zimanzaniyê, zanistê, fîlolojiyê, rûdêma zimên ji me ve bi mij û moran e.

Gava kurdekî li Batmanê peyva „zimanê me „ tê ser zimanê wî, hîç zimanê Mewlewî, yê Nalî, yê Pîremêrd û yê din û yê din ku ew hîç ji wan fêm nake, ne di bala wî de ye. Ji ber regeza xwe, ji ber kurdbûna xwe, dikare bibêje ew bi zimanê min dinivîsin. Lê ev di bingeha xwe de hizrek çewt e. Berovajî jî rast e, mesela eger yekî/yeke li Ranye, yan Kelar yen Seqiz yan deverek din î Kurdistanê ku dibêje zimanê min, hîç zimanê ku Cegerxwîn pê nivîsîye, yê Feqê Teyran, Bateyî û Cizîrî û ê din û ê din wê kêlîkê ne di bala wî/wê de ye.

Gelo ji ber van sebebên ku me li jor binavkirine tenê divê mirov bibêje „zimanên kurdî?“ yan jî hin sebebên din hene, mîna sebebên fîlolojîk?

Bi baweriya min ku em kurd bi hestên xwe li zimanê xwe dinêrin, ji ber bindestiya zêde, ji ber bêpariya ji derbirrîna bi kurdî ku bi dehê salan dirêjkiriye û hîn jî berdewam e, em naxwazin mukur werin ku zimanê me jî ne yek e. Yanî ez ê çawa li soranî binêrim mîna ku li kurmancî dinêrim? Yek bi alfabeya erebî ye, gramer û rêziman cuda ye, ferheng û gencîneya peyvan ya ku xelk pê diaxivin cuda ye, berhema ku li Silêmaniyê dertê, ku neyê „wergerandin“ bo ser „zimanê kurmancî“ qet ê neyê xwendin û fêmkirin. Her weha berhema ku li Amedê bi latînî çap dibe, tev li gencîneya „zimanê soranî“ nabe, divê ew jî bête wergerandin. Ji xwe tecrubeya min di vî warî de hiştiye ku ez bigihim vê encamê. Xwênerên soranî qet haya wan ji wêjeya kurmancî nîne, xwênerên kurmanc jî her weha. Eger niha ne ev tevgera wergerê ba, ku berhem ji herdu „zimanan“ bo herdu zimanan têne wergerandin, wê ji bo xwendevanên herdu aliyan, wêjeya aliyê din her biyanî û nenas ba.

Ji xwe peyva „wergerandin“ ku min hin caran ji bo nûçeyên weşandina pirtûkên xwe yên bi soranî bikardianî, gelekî bi xwendevanan nexweş dihat. Ewan digot: ziman yek e, çima peyva wergerandin mamoste? Ev tenê ji bo guheztina berhemekê ji zimanekî bo zimanekî din tê bikaranîn. Hîç ne minasib e em ji bo guheztina berheman di navbera soranî û kurmancî de bikarbînin!

Em kurd in erê. Lê çima em qebûl nakin ku „zaravayên me“ yên sereke zimanin li halê xwe ne û ne zaravayên zimanekî din in! erê nêzîkî hev in, pirr gotinên hevpar hene, lê gelek zimanên ji hev cuda nêzîkî hev hene mîna holandî û almanî. Peyvên hevpar di navbera me û farisan de jî bi sedan tew belkî bi hezaran in. Ew nayê wê wateyê ku zimanê me û farsî yek in.

Hin diyarde di civaka me de, di tarîxa me de, û her weha di zimanên me de hene , belkî ne bi dilê me bin, lê divê em wan mîna „rastiyek tehl“ qebûl bikin. Ji roja roj de soranî û kurmancî dûrî hev, ji hev bê agah bi pêş ve çûne, hayê Nalî ji şêx Nûredînê Brîvkanî nebû. Hêmin bi awayekî û zimanekî dûrî awa û zimanê Cegerxwîn dinivîsî. Niha jî her weha maye. Rast e em niha bêperwa peyvên hevdu bikartînin. Min bala xwe dayê ku eîlta soranî jî têra xwe sûdê ji kurmancî werdigrin. Gelek peyv niha bûne milkê soranî ku bi eslê xwe kurmancî ne. Em jî wek kurmanc têra xwe, bê hesab peyvan ji soranî tînin. Ji xwe ev bêminnetî ye, herdu ziman jî milkên gelê kurd in. Lê ya ji min ve diyar ew e ku „zaraveperestî“ dikare di pêncî salên li pêşiya me de vê kêşeyê gurrtir û kûrtir bike. Ew jî gelekî asayî ye: milletek û du sê ziman. Wek xewnekê herdu zaraveyên bingehîn, yan herdu ziman dikarin bêtir nêzîkî hev bibin, lê ev projeyek e ku dê bi dehê salan dirêj bike, û divê mejiyên mezin li pê vê prosesê bin yan na, divê em vê rastiyê (pirrzimaniya kurdan) him wek dewlemendiyek kurdan û him jî wek bêşensiyekê qebûl bikin.

Îran dixwaze kurdên Rojhilatê li Başûr eşrefîze bike

Kurdên rojhilatî divêt têbigihên ku kêşeya wan kêşeyeka neteweyî ye; sînorên îdeolojîyên çep û rast têper dike, tixûbên navçeyên kurdistanî têper dike, barîyerên zimanî di nav kurdan de têper dike. Meseleya kurdan li Rojhilatê tenê meseleya mafan e, mafên kollektîv yên neteweyekî, ku ti mecal jibo hemwelatînîyê derveyî netewe-dewlet yan di haleta herî kêm sîstema konfederal de nîne. Heger naxwazin eşrefîze bibin, divêt stratejîyeka nîştimanî dabirêjin.

BEXTÎYAR HESENZADE

SERTÎPÊ pasdar, Îrec Mescidî, şêwirmendê bilindê fermandeyê Hêzên Quds ên Spahê Pasdarên Îranê wekî sêyemîn balyozê Îranê li Iraqê dihête destnîşan kirin. Berî Mescidî sefîrê Îranê li Iraqê Husên Danayîfer bû, ku wî jî di karnameya karê xwe de cîgirîya Hêzên Deryayî yên Spahê, fermandehîya Qerargeha Avadanîya Xatem un-Nebîyîn û serokatîya Fakulteya Fermandehî û Komandarîyê kirîye. Heman Danayîferî roleka berceste di valakirina Kampa Eşref û derxistina Mucahidên Xelq ji Iraqê de leyîst. Berî wî jî Husêyn Kazimî yê Qumî wekî yekemîn sefîrê Îranê piştî Şerê Îran-Iraqê di sala 2006an de hatibû destnîşan kirin. Tişta balkêş ew e, ku ev her sê zat jî xwedî pêşîneyeka endametîya Spahê Pasdaran, bi taybet hêzên dersînorî yên wê, Spahê Qudsê ne.

Îrec Mescidî di salên 80î de Serokê Komdarîya Qerargeha Remezan bû. Qerargeha Remezan yekîneya serekî ya helmetên eskerî yên Spahê Pasdaran li derveyî Îranê, bi taybet li Iraq û Lubnanê bû. Şerê li dijî rêxistin û peşmergeyên rojhilatî tevî çend qerargehên din gelek caran ji vê qerargehê dihat organîze kirin. Qerargeha Remezan hêzên şîe yên Bedir li perwerde dikin û ew li dijî rejîma Sûrîyê bi kar dianî. Qerargeha Remezan paşê bû Spahê Qudsê.

Bûna Îrec Mescidî li Iraqê ne nû ye; Mescidî bi salan e di bin sîwana Spahê Qudsê de li Iraqê operatîv e. Bi gotina Mescidî vê gavê xeta pêşîyê ya çekdarên îranî Mûsil, Lubnan, Heleb û Sûrîye ye. Mescidî beşdarîya rasterast ya hêzên îranî di şerên li Iraqê de înkar dike,dibêje hebûna endamên Spahê Pasdaran tenê jibo rahênan û rawêjkarîyê ye. Ji vê encam dihête girtin, ku balyozê nû yê Îranê li Iraqê ji berpirsekê dîplomatîk bêhtir wekî koordînatorê grûpên mîlîşîya yên şîe hatîye Iraqê. Destnîşankirina generalekê din yê Pasdar vê digihîne, ku Îranê li Iraqê ji peywendîyên dîplomatîk zêdetir serdestîya eskerîya xwe bi ser hikûmet û mîlîşîyayên şîe de radigire. Heşda Şeibî ya şîeyên Iraqê kopîyeyeka rasterast ya Spahê Pasdaran e. Dîplomatên Îranê li Iraqê entegreyî sîstema berevanî û eskerîya Iraqê bûne.

Di vê arasteyê de ye, bi teşwîq û handana dewlet û hikûmeta Îranê, parlamenterên partîya Dewleta Qanûnê, ku serokatîya wê Malikî dikêşe xerîkî amadekirina pêşnîyazbiryarekî ne, ku hêzên kurdî yên Rojhilatî yên li Herêma Kurdistanê ji çek bikin yan ji Herêmê û ji Iraqê bi giştî derêxin. Ango Îran bi nîyet e, ya ku li Kampa Liberty û Eşrefê anî serê Mucahidên Xelk, li Silêmanî, Behrik û Cêjnekanê bîne serê HDKA, HDK, hersê rêxistinên Komeleyê û rêxistinên biçûk ên din ên rojhilatî.

Heta vê derê kêşe zelal e; ecem şûrê xwe yê bi nav û deng li hewa ba dide û dijminatîya xwe ya dîrokî lidij kurdên rojihilatî eyan û eşkere radixe ber çavan. Ya gring di vir de ew e, ka rêxistinên rojhilatî çi kirine û dê çi bikin. Nûnerên şeş rêxistinên rojhilatî li baregeha Komeleya Zehmetkêşên Kurdistana Îranê kom bûn û di beyaneka muşterek de dijayetî û protestên xwe li dijî vê helmetê derbirrîn. Û derbirrîn dê çi bibe? Gelo dikarin pêşîya helmetên Îranê jibo jinavbirina hêzên rojhilatî bigirin? Û gelo çi amraz di destê rêxistinên rojhilatî de hene, ku berengarî li helmetên îmhayê yên Îranê bikin? Gava ku Mucahidên Xelk di pêvajoya îmhakirinê bi destê rêxistinên bi wekalet yên Îranê de (Eshab ul-heqq, Hizbullah û hwdên iraqî) dihatin bombebaran kirin, gelo neket hişê rêxistinên rojhilatî ku dê dora wan jî bihêt?

Rêxistinên rojhilatî piştî êrişa şeva Yeldayê, ku bi danîna bombeyan çend pêşmergeyên HDK têde canê xwe ji dest dan, li hev kom bûn û komîsyoneka ewlekarîyê ava kirin. Vanê jibo berengarbûna hewlên Îranê jibo derxistina wan ji Iraqê jî komîsyon damezrandine. Lê gelo ev tedbîr dê têrê bikin? Gelo ev pozîsyona defensîv dê bikare kurdên rojhilatî ji êrişên peyderpey yên Îranê biparêze? Çima heta kêr negihîje hestî rêxistinên rojhilatî nayêne dengî û komîsyonên xebatên muşterek ava nakin?

Ev e cewherê nasyonalîzma reaktîv. Kurdên rojhilat bi rêxistinên xwe ve letlet bûne. HDKA bûye du hizb, Komele bûye du sê hizb û durist di van hel û mercan de ku divîyabû jibo gelê mezlûm û sitemdîde yê Rojhilatê sîyaset û vatişeka hemwar peyrew bikin, jibo pozîsyonên xwe ketine qirika hev.

Rêxistinên rojhilatî jibo parastina hebûna xwe, jibo berengarbûna li hember Dewleta Komara Îslamî ya Îranê mecbûr in stratejîyeka nîştimanî dabirêjin. Lê jibo stratejîyeka wisa divêt liser çend xalan sax bin. Pirsa kurd li Rojhilatê ne pirsa rejîmguhertinê, ne pirsa opozîsyonê, lê pirsa mafên neteweyî ye. Jibo dabînkirina van mafan, divêt kurd bibine xwedanê statûya hemwelatînîyê. Tenê şansê ku bikarin bibine hemwelatî ew e, ku bibine xwedîyê netewe-dewleta xwe yan eger helûmerc dest bidin, divêt serwerî li Îranê bihête nenavendî kirin, sîstemeka federal yan konfederal bihête damezrandin, evca kurdan heman maf hebin, ku farsan hene. Hingê renge sîstemeka wisa de kurd bikarin mafên hevsan wekî etnîsîteya serdest wergirin, lê gelo bi nebûna nerîta demokrasîyê tiştekê wisa di ayindeyeka nêzîk ango di perspektîveka 40-50 salan de pêkan e? Gelo kapasîteya gelên Îranê, bi taybet ya farsan heye, ku di ayindeyeka wisa de hazir bin desthilatê bi gelên ku bindestê wan bûne re parve bikin? Jibo ku tiştekî wisa çê bibe, guhertineka bineretî ya mental, civakî û sîyasî di tar û poyê civaka Îranê de şengistî ye. Lê helûmercên ku li ber çavan e, asoyeka wisa nade ber çavan. Vê gavê rejîma Îranê ne bi oppozîsyona îranî ne jî bi ya kurdî dihête guhertin, ne jî bi wan dihête demokratîze kirin. Tenanet heger demokratîze bibe jî ne şert e, mafên terîtoryal, kollektîv û neteweyî yên kurdan dabîn bike. Demokrasî tenê pêşmercekê sîstema federal ya funksîyonel e, lê ne garantî ye, ku di sîstemeka demokratîk de federalîzm realîze bibe.

Ji lewre, kurdên rojhilatî divêt têbigihên ku kêşeya wan kêşeyeka neteweyî ye, sînorên îdoelojîyên çep û rast têper dike, tixûbên navçeyên kurdistanî têper dike, barîyerên zimanî di nav kurdan de têper dike. Meseleya kurdan li Rojhilatê tenê meseleya mafan e, mafên kollektîv yên neteweyekî, ku ti mecal jibo hemwelatînîyê derveyî netewe-dewlet yan di haleta herî kêm sîstema konfederal de nîne. Li ser vê arasteyê divêt rêxistinên rojhilatî şîzmên xwe yên îdeolojîk daynine alîyekî; hebûna wan û hebûna neteweyê kurd li Rojhilatê di metirsîyê de ye; divêt jibo beqaya xwe û miletê xwe stratejîyeka nîştimanî dabirêjin û lidor wê stratejîyê rêbazeka nîştimanî, vatişeka neteweyî – demokratîk hilbijêrin.

Bavê bîra neteweyî Mustefa Barzanî

■ HEMÎDÊ SMAÎLAXA

Barzanîyê Mezin, di zaroktîya xwe de, bi malbata xwe re li Dîyarbekirê, di zîndanê de jîya. 11-12 salîya xwe de, bi çavê xwe bidardakirina brayê xwe Şêx Abdusselam dît. Di 16 salîya xwe de bû pêşmergeyê xwebexş.... Heta bi bêhnvedana dawîn her pêşmerge ma.

DEMA meriv bixwaze liser hin kesayetîyên dîrokî tiştina binivîsîne, ne gelekî hêsan e, lê dema meriv li ser lehengina ku ji dîroka miletekî re bûne sembol an dannasîna jîyana wan, jîyan û dîroka wî miletî bi xwe be, nivîs û raman gelekî grantir dibe.

Ger nivîs û gotar liser General Mele Mustefa Berzanî be, ji xweber dibe barekî ku nayê hilgirtin, berpirsîyarî mestir dibe û bêhemdî xwe, meriv xwe di nav rûpelên dîroka têkoşîna miletê kurd de dibîne. Ji berşîrî hetanî bi bêhnvedana dawîn, jîyana Mustefa Berzanî, jîyaneke bi xebat û tekoşînê rapêçayî, di dîroka rizgarkirina gelên bindest de, bê emsal e.

Bavê hizr û bîra neteweyî Barzanî yê mezin, di 14 Adar a 1903an de, li gundê Barzan hatîyê dunyayê. Gundê Barzan, hawîrdor bi çîyayan rapêçayî li kêleka çemê Zê (Zap) navendeke zanîn û xwendinê ye. Bi îcazeta Seyid Taha yê Nehrî, bi sofîtî - şêxîtîyê gundekî di warê dînî de jî bi rûmet e û tesîr li der û dora xwe dikir.

Destpêka sedsala 20î, bi taybetî li Kurdistanê, serdema guherandinên mezin in. Kurdistan du beş e û beşekî Kurdistanê di nav Împ. Osmanîyan de ye. Berê împaratorîyê li belavbûnê ye.

Barzanîyê Mezin, di zaroktîya xwe de, bi malbata xwe re li Dîyarbekirê, di zîndanê de jîya. 11-12 salîya xwe de, bi çavê xwe dardakirina brayê xwe Şêx Abdusselam dît. Di 16 salîya xwe de bû pêşmerge û heta bêhnvedana dawîn her pêşmerge ma.

Ji ber bûyera dardakirina brayê wî Şêx Abdusselam, bandoreke mezin liser jîyan û hizr û bîra Barzanîyê mezin kir, bi kurtî be jî em hinekî li sêdaredana wî vegerin:

*Di buhara 1907ê de, êdî zor û sitemê kêr gihande hestî. Pêwîstîya bi hevdîtina bi rêber û serokên eşîran hebû. Bi vê mebestê, civînek li mala Şêx Mihemed Nûr Brîfkanî damezra. Şêx Abdusselam beşdarî vê civinê bû. Di civînê de devjenî liser rewşa Kurdistanê bû. Encama vê civînê ji Babî Alî, birêvebirina Osmanîyan re, bi telegrafekê hate şandin:

Daxwazên kurdan ev bûn:

1- Di deverên kurdan; Akrê, Duhok, Zaxo, û Şingalê zimanê resmî divê kurdî be.

2- Zimanê perwerdeyê bi kurdî be.

3- Karbidestên birêvebirinê (gerînendeyên nahîyeyan, qaymeqan û hwd) divê ji kurdan bin û bi kurdî zanibin

4- Îslam dînê dewletê yê fermî ye, divê huqûqê şerîetê pêk bê. Biryarê tên wergirtin bi Îslamê re lihevkirî be.

5. Mezhebê kurdan Mezhebê Şafiî ye, divê li ber çav bê wergirtin.

6- Sîstema bacê wek xwe bimîne, lê baca tê hevdan li gora pîvanên huqûqa Îslamê be

7. Baca ji Kurdistanê tê hevdan divê jibo avakirina xwendegaha û rêyan bê bi kar anîn.

Ev telegraf wek serhildana kurdan hate pejirandin û Abdulhemid, Sultanê Osmanîyan, li dijî kurdan seferberî îlan kir.

Kurdekî sitemkar Suleyman Nazîf di vê demê de bû walîyê Mûsilê. Walî leşker şandin ser mintiqê û xwest Şêx Abdusselam bigire.

Şêx Abdusselam teslîm nebû, lê di ber xwe jî neda. Xwe da alî û çû hêla Îranê, bi bêbextî hate girtin .

Şêx bi saroceftê (bi lez û şeklî) hate mahkeme kirin û biryara dardakirina wî hate dayin, biryar demlidest hate bicihanîn. Ev bûyera li ber çavê Musatafa Barzanî cirîya ku ji bo wê demê weha dibêje:

"Ew roj baş tê bîra min. Wek agir bi Mûsilê ketibû, germayak mezin dibarîya. Qelebalixîyeke giran bi birayê min re, ber bi cihê dardakirinê diherikî. Em di destpêkê de ber bi çol û çîyan ve revîyabûn. Belê wê rojê, bi çend hevalên xwe re, jibo ez termê birayê xwe yê daleqandî bibînim, bi dizî em ketibûn nav wê qelebalixîyê. Tu kesekî, bêyî biryara dewletê, guman nedikir ku Walî dê vî karê nemirovane bike. Çawa dikare bi serê xwe bike? Ma gava dewlet pê bihise ew ê Sulêman Nazîf jî bidardaneke?

Ez di wê demê de 10-12 salî bûm. Li kolana maneya azadîyê, adaletê, wekhevîyê û biratîyê ku guhên me qul kiribû, min ezber kiribûn. Me digot belkî ev bêje yan stranek e. Lêbelê, bi navê azadîyê, azadîya mirovan ji destê wan dihate girtin, bi navê adaletê, mirov bi kêfa dilê xwe dihate dardakirin, bi navê wekhevîyê, destek serbêjing dihatin parastin û bi navê biratîyê xwîna "birayên xwe" dirijandin. Min di vê hewayê de çavên xwe vekirin, di vê atmosferê de, şîrê dayika xwe di zîndanê de mêt, di vê rewşê de, min termê birayê xwe, li dergehê Mûsilê dardakirî dît.

Ez liser pişta hêstirekî siwar, her li birayê xwe dihizirîm, cendekî wî yê bidardakirî, qet ji ber çavên min nediçû. Bi wî mejîyê zarotîyê min ji xwe re digot; li şûna ku mirov bi nehaqî bê dardakirin, li çîyan, li daristanan bibe xwarina guran, bihête parçekirin baştir e. Wê gavê min sond xwar ku tu caran nekevim zîndanan. Belkî ez bihatama kuştin, parçekirin, birevîyama, lê ez ê neketima girtîgehan û di destê walîyekî bi vî rengî dirrinde de min dê gîyanê xwe nedaya. Min bi vê felsefeyê dest bi jîyanê kir, mirin dê heba, lê berdestbûn, teslîmbûn na. Mirin belê, ketina zîndanê na! Bi tenê çareyek vî tiştî hebû; dostanîya bi çîyan re:" *

Ger ez bi hûrbînî li ser jîyana Serokê Nemir rawestim, tevaya jîyana wî hêjayî gotinê ye û peyv-gotin têrê nakin da meriv bi dilê xwe li ser wî binivîsîne. Lê bi kurtî be jî çend buyerên îro jî, ji kurdan re pêwîst e ku bixwînin û dersan jê werbigirin bînim bîra xwendevanên hêja.

Min bi xwe ji Serok Mesûd Barzanî guhdar kir

Dora Rewandûzê ji dijmin hatîye paqij kirin. Xelkê deverê, ji nav Rewandûzê û hin serkirdeyên Pêşmergeyan, serdana Mele Mustefa dikin û pêşnîyaz dikin ku êdî dikarin navenda bajarê Rewandûzê ji dijmin rizgar bikin.

Barzanî ji wan dipirse: jimara rûniştevanên nav bajêr çend e? Xweparastina li hemberî topên dûravêj çendî pêkan e? Alîkarîya lojîstîk ji wan re ji ku û çawa digihê pêşmerge? Jimara şerkaran-pêşmergeyan çend e? Û rewşa wan ya xwedîkirina pêşmerge çendî zor e?

Bersivên wan: 20-25 hezar rûniştevan dikarin ji bajêr derkevin û bibin barê stuyê wan, alikarîya lojîstîk hemî di ser Rewandûzê re digihêje wan, xweparastin li hemberî topan ne pêkan e û di rewşa wan ya wê serdemê de ji xwe, di xwedîkirina şerkaran de destengî heye.

Barzanîyê mezin bi pêşbînîyeke mezin wê daxwazê napejirîne û kurdan ji dijmin re nake nêçîr, nahêle derbeder bibin.

Ger meriv bi rewşa îro re bide ber hev, beramberî hev bike, ji kavilkirin, cîhêlî û wêrankirina Sûr a Dîyarbekirê, Nisêbînê. Cizîrê, Slopîyê, Geverê û gelek dever warê kurdan her weha ji rojavayê Kurdistanê re dersek e.

Dîsa; di salên 1960 an de, Ciwanên kurd digel Mam Celal Talabanî (ji Yezdan hêvîya tendurustîyeke baş ji bo cenabê wî dikim) di serdanekê de ji serokatîyê re dibêjin: pêşverûyên 'Ereb alîkarîyê ji wan dixwazin. Ger em Kurd alîkarîyê bi braderên pêşverû yên 'ereb re bikin; em dikarin Abdulkerîm Qasim ji desthilatdarîyê daxin.

Barzanî ji wan dipirse, ka piştî daxistina Abdulkerîm Qasim kî dê bibe desthilatdar?

Ew bersiv didin: Pêşverûyên 'ereb.

Barzanî dibêje: Ango Be'esî, nîjadperest. Em ditirsin ku em bi findê li Abdulkerim Qasim bigerin. Em nuha pirsa kurd û Kurdistanê bi vê desthilatdarîyê re dikarin bînin rojevê, li ser biaxifin. Belam siberoj nijadperest vê derfetê ji xwe nadine me.

Ya duduyan ya herî girîng; em ji bo guherandina desthilatdarîya 'ereban, em xortên kurdan nakin qurbanî.

Ev her du numûne jî îro ji bo me ji kurdên her alîyî re, hêjayî xwendinê ne. Pirsgirêk bi sîstemê re ye. Em pirsa xwe bikin çima yên dijminaya bi kesayetîyan an bi hin alîyan re û bibin keresteyên guherandina desthilatdarîya dagirkeran em çawa bigihêb mafên xwe yên rewa?

Numûneyeke din ya serfirazî, serbilindayî û ji xwe bawerbûna Barzanîyê Nemîr jî di serdana Şahê Îranê, Muhemmed Riza Pehlewî re ye, ku me ji Kovara Gulan wergirtîye. Ez dirêj nakim; berîya çavpêketinê Serleşker Ahmedî di Qesra Seidabadê de ji Barzanî dixwaze ku serê xwe li ber şah biçemîne.

-Çaxê tu digihîje nik Şah, gereke tu serê xwe biçemînî....gereke tu...."

Barzanî gotina wî dibirre û bi tundî lê dizivire:

-Em kurd, ji tu kesî re, hînî serşorkirin û serçemandinê nebûne. Serxwarkirin di gerdîş (`adet) ên me de şerm e û kêmanî ye. Em bi tenê ji Xwedê û ji gelê xwe re serê xwe xwar dikin.

Barzanî bîranîna xwe ji wê rojê wiha vedigêrre: "Şahê Îranê pirsa rewşa min kir û got: Werin, çekên xwe bidin leşkerê Îranê û ez dê zevî, zozan û gundên xweş û pêdivîyên we yên jîyanê bidim we."Lê min axaftina Şah birrî û got: Pirranîya şênîyên wan gund û bajarên Îranê, bi destên we hatin kuştin û mixabin, leşkerên we destê xwe dirêjî namûsa xelkê Îranê kir."

Neteweyî hizirkirin, demokratbûn, jixwebawerbûn, parastina berjewendîyên gel û jîngehê, paqijî û berdewamîya xebatê, bingeha rêbaza Barzanî ye. Di 38 salîya salvegera koça dawîn de, pêwîstî û pêdivîya Miletê kurd bi van hêjayan ye.

PARLEMENTERÊ HDPÊ ADEM GEVERÎ: EM MINNETDARÊ BARZANÎYÊ NEMIR IN

Gava ku mirov hinekî li dîroka Kurdan mêze dike, hûr û kûr dinêre, tê dîtin di dîroka bêyom a Kurd û Kurdistanê de ya ku li ser têkoşîna bo bidestxistina mafê xwe hatî avakirin, gelek mêrxas, canfida û pêşeng hatine. Riha azadîyê bi xêra wan kesena tê dikeve rih û mêjîyê civaka kurd. Tekoşîna kurdan bi xêra wan kesên xwenaskirî, qehreman û canfida her wekî çîyayekî bilind bir rûmet, xurt û azad dimeşe.

Îro 38emîn salvegera koçkirina ji dinyayê ya Mela Mistefa Barzanîyê Nemir e. Nemir Mela Mistefa Barzanî di 14ê Adara 1903an de, li Barzan ji dayik bû. Di hemû jîyana xwe de her têkoşîna azadîyê da. Di 1ê Adara 1979an de, gava ji ber nexweşîya pençeşêrê li nexweşxaneya George Town ya li Washingtona Amerîka dihate dermankirin, koça dawî kir.



Di nav dîroka kurd û Kurdistanê de malbata Barzanîyan yek ji wan xanedan û fermanrewayên Kurdistanê yên pak û paqij û qedîm in. Şerefxanê Bedlîsî di şaxê mîrek û malmezinên Kurdistanê de, piştî fermanrewayên Erdelan û Hekkarî, hikimdarîya Behdînan tîne ziman û pir sitayîş û şehnazî qala vê malbatê dike...

Nemir Mela Mistefa Barzanî, ji bilî ku bi xwe dîrokek e, di jîyana xwe de pêşî dor daye azadkirina gelê kurd û Kurdistanê. Jîyana wî ji bo azadî û serbilindîyê bangek e, pêşî ji bo kurdan, paşê ji bo hemû gelên bindest. Tekoşîn û mêrxasîya Nemir Mela Mistefa Barzanî di dîroka dinyayê de jî cîhê xwe girtîye. Miletê kurd deyndarê serokê dîrokî û netewî Nemir Mela Mistefa Barzanî û hemû pêşmergeyên rêbaza azadî û rizgarîya miletê kurd in.

Em, bi minasebeta salvegera 38emîn a mirina Mela Mistefa Barzanîyê Nemir û hemû pêşeng, qehreman û canfidayên Kurdistanê di şexsê Nemir Mela Mistefa û malbata wî de bi minet û bi rehmet bi bîr tînin. Xwedayê Teala, xîreta wan, fedekarîya wan, şehedeta wan qebûl bike û bi rehma xwe şad bike.



Hişê kolonîzebûyî, zanavê kolonîzebûyî (1)

BEHROOZ SHOJAI

Ev nivîsar hewlek e, ku ligor teorîyên post-kolonyal, rohnîyê biêxe ser kartêkerîyên praktîka kolonîzasyonê liser "hişê" kurdan. Peyva "hiş" di vir de di wataya "mind"a inglîzî hatîye bi kar anîn. Zihniyeta kolonîze yan hişê kolonîzebûyî li her parçeyekê Kurdistanê bi teherekê cuda xwe nîşan dide, lê jibo sînorkirina vê lênêrîna kurt, gotar dê xwe li tixûbên bakurê Kurdistanê sînor bike. Etûdên post-kolonyal piranî di nav teorîsyenên afrîqayî de baw e; em dixwazin bi peyrewkirina van teorîyan ketwarê ku li bakur cîgir bûye şirove kirin. Mîrasa herî mînende ya kolonyalîzmê bandora nerênî liser xwe-bînîya civakên kolonîzebûyî ye. Kolonyalîzekirin bi zorê, lê ragirtina wê bi prosesên subtîl(binveyî) yên hejemonîk hatîye encam dan, ango qazanckirina dil û hizrên civaka kolonîzebûyî bi rêya meşrûiyeta pratîka ziman û edebiyat, tradîsyonên kulturî, normên civakî, nirx û bawerîyên zimanê kolonyal, kurt û kurmancî afrandina jîngeheka kolonyal. Teorîsyenê etûdên kolonyalîzmê Totep vê prosesê wekî kolonîzasyona mental bi nav dike û destnîşan dike ku îro kolonîzasyon bi rêya dekulturîzasyonê dihêtê realîze kirin. Dekulturalîzasyon dihête wataya veşûştina hişê takên wê etnîsîteyê ji kultura wî/wê.

Mis-education: bedperwerde

Di hevtevna bakur de, bi taybet piştî Tenzîmatan, siyaseta kolonîzekirina hişê kurdî bi proseseka din re hatîye peyrew kirin, ku ew jî bed-perwerde ye. Vê bed-perwerdeyê amraz, biker û armancên xwe hene û ji lewre em li bakur gelekê dibînin ku nimûneyeka klasîk ya gelên di hêla mental de kolonîzebûyî ye. Piştî têkbirina mîrnişînên kurd, otorîteya osmanî û paşê komarê sê tîpên kolonyalîzmê peyrew kirine ku birîtî ne ji a. ya terîtoryal, b. ya ku Adisa Ajamu (1997) wekî kolonyalîzma entellektuel bi nav dike û c. ya ku Uhuru Totep wekî kolonyalîzma mental pênase dike. Amajeyî serdema osmanî hate kirin, jiber ku prosesa kolonyalîzma terîtoryal piştî hilweşandina mîrnişînên kurd hate dest pê kirin û bi Tenzîmatê ev proses derbasî asta entellektuel bû. Bi nemana patronaja mîrnişînan afrînerîya zimanî bi kurdî jî heta radeyeka berfreh hate rawestandin û yên ku perwerdeyeka hevçerx didîtin tenê di xwandegehên fermî yên dewletê de dihatin perwerde kirin. Siyaseta asîmîlasyon û dejenerasyona kurdan hêj di destpêka sedsala 20an de dîyar e.

Delîla vê çendê mirov di nav rûpelên kovar û rojnameyên kurdan yên destpêka sedsala 20an de jî dibîne; herçî kurdên bakur in, ji bilî Colemêrg û Botan, bi tirkî dinivîsin, yên başûr û Rojhilat jî bêhtir bi kurdî xwe derdibirrin. Di sala 1918an de, bi vajoya xortekê Sîweregî nameyek bi tirkî jibo kovara Jînê hatîye şandin, ku têde gazinde ji xelkê bajarî dike û dibêje: "Li van derana di nav qesebeyan de, di çarşî û bazaran de dan û standin bi kurdî be jî, şênîyên qesebeyan xwe ji kurdbûnê dûrgirtin pêwîst dibînin. Jiber ku gundî rastî heqaretê, mehkûmê zulmê, melûfî xedrê ne, loma kurdên bajarî xwe di bi kurd nav kirinê de tereddudê dikin." Heger em gazindeya vî camêrî bawer bikin, divêt em mukur bihên ku asîmîlasyonê berî



Takê bedperwerdeyî, yan tirkperwerdeyî yê kurd, asoyên hizr û kirdarên xwe tenê di paşxaneka konseptuel ji ziman, çand û perwerdeya tirkî de wêne dike. Bi sînorkirina xwe di nav vî rûberê kulturî û rewşenbîrî de, takê kurd xwe diêxe hebseka mental (kolonî) de, ku tenê seteka lensên (tirkî) wî yên dîtinê hene.

damezrandina Komara Tirkiyê dest pê kiribû.

Modernîte û ojenîzma ku çeperên rewşenbîrên kurd guhert

Dawîya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an serhildana modernîteyê û hizrên pêve girêdayî di pantaya cografyaya osmanî de dest pê dike. Kurd jî nesîbê xwe ji vê trendê dibînin û entellektuelên kurd cezbî wê dibin. Gava ku mirov li tendensên wan yên siyasî dinêre, heta dûmahîka Cenga Cîhanî ya Yekek (CCI) piranîya rewşenbîrên kurd di wê serdemê de girêdayî hizreka neteweyî-kurdî ne û di qalibê rêxistinên wekî Cemîyeta Tealî ya Kurd, Cemîyeta Hêvî û hindên din de hatine rêxistin û berhemên wan yên siyasî, civakî û edebî di organ û weşanên van rêxistinan de dihêne weşandin. Piştî CCI trendeka din di nav rewşenbîrên kurd de serî hildide, ku ji nêzîk ve girêdayî trendên îdeolojîk û siyasî yên deheyên 20 û 30 yên Ewropayê ye. Ev her du dehe bandeva meylên modernîteya ojenîk temsîl dikin, ku çavkanîya wan îdeolojîyên bîyolojîya nijadî li Rojavayê ye. Bingehê van îdeolojîyan bawerî bi celebekê sosyaldarwînîzmê ye, ku dîyalektîka beqaya nijadan di paqijî û islahê (ojenîk) de dibîne. Hindek rewşenbîrên kurd di arasteya bawerî bi serdestîya nijadî û kulturîya tirkan alî diguherin û tenanet dibine îdeologên Komara Tirkiyê. Hişmendîya tirkî ya Ittihad û Tereqqîyê liser şengistên modernîteya hingê diniqute nav hişê kurdên entellektuel; terkîbek ji vê hişmendîyê di qalibê cîhanbînî û stîla jîyanê wekî normên mirovî û gerdûnî dihêne hilgirtin û dibine normên çîna entellektuel û bilind a kurd.

Komar û dekuluralîzasyona kurdan

Sîstema perwerdeya modern li Tirkiyê prosesa dekulturalîzasyona kurdan dide dest pê kirin, ku di sê merheleyan de dihête bedî anîn. Yekem, kurdên xwedêgravî xwande berêvke dihêne hevotin ku ji zanavê xwe yê kurd "yê paşketî" şermê bikin û mîrasa xwe ya kurdî înkar bikin. Di qonaxa duyem de, di xwandegehan de dihêne fêr kirin ku bibine heyranê mîrasa tirkan û rêzê bo wê mîrasê bigirin. Jibo Ziya Gokalp mîrasa kurdî tenê çavkanîya şermezarîyê ye, lewre tûranîzm jibo wî mîraseka bi şanazîtir e. Qonaxa sêyem ew e, ku ew teslîmî vê doktrînê bibin û gava ku hatine doktrîne kirin dikarin bihêne xelat kirin û derfet hîn bêhtir bikevine destê wan. Dûmahîkê gava ku qenc hatine doktrîne kirin, derfet jibo wan dihête rexsandin ku bi awayekê profesyonel karekê ligor doktrîna wergirtî encam bidin. Bi encamdana vê yekê kilîta hundirî ya desthilat, prestîj û avantajan jibo wan vedibe. Sulêyman Nazîf ewilî dibe alîgirê doktrînên Ittihad û Tereqqîyê û gava ku teslîmî vê doktrînê dibe bi walîtîya Mûsilê dihête xelat kirin û dibe beşek ji sîmayê desthilata tirk. Sîstema perwerdeya osmanî û komarê di prosesa dekulturalîzasyonê de serkeftî bûne. Piranîya kurdan di qelemrewa osmanî de serdestîya tirkî û sazîyên tirkî bi ser jîyana xwe de qebûl kirine.

Hebsa konseptuel û mental ya kurdan (kolonî)

Encameka din ya vê mentîsîda perwerdeyî ew e, ku Wade Nobles (1986) wê wekî hebsa konseptuel bi nav dike. Takê bedperwerdeyî, yan tirkperwerdeyî yê kurd, asoyên hizr (û kirdarên) xwe tenê di paşxaneka konseptuel ji ziman, çand û perwerdeya tirkî de wêne dike. Bi sînorkirina xwe di nav vî rûberê kulturî û rewşenbîrî de, takê kurd xwe diêxe hebseka mental (kolonî) de, ku tenê seteka lensên (tirkî) wî yên dîtinê hene. Di vê astê de hebsbûna konseptuel bi rêya ziman êdî ne cebrî lê xwesepandî ye. Bi vî halî, berteskbûneka perspektîvê li ba wî çê dibe; normên rewşebîrî û kulturî yên tirkî jibo wî/wê dibe normên gerdûnî û buhurbar û herçî normên din hebin – bi taybet normên ku ji repertoara zimanî-kulturî ya kurdî serçave werdigirin – bo wî/wê nebuhurbar dihêne li qelem dan. Çînên navîn û bilind ên kurd bi vê mentîsîdê dihêne dekulturalîze kirin ku kesayetîyeka seyr û semere diafre. Totep jibo reşikan fraza Zencîyê Dekulture (decultured Negro) bi kar dihîne. Di hevtevna kurdan de mirov li bakur dikare wan wekî "kırro" bi nav bike. Kırro, awayê turkîfîyebûyî yê "kur-o"ya kurdî ye, ku ji "kur" û kasûsa vokatîv (bangkirinê) "-o" pêk hatîye. Jiber ku kurd gelek caran hevûdu wekî "kuro" bang dikin, di zimanê devkî yê tirkan de bi niyeta biçûkxistinê peyva "kırro" jibo kurdan hatîye bi kar anîne. Bi bawerîya min du awayên "kırro"yan li bakur dihête dîtin. Yek ew in, ku Totep wan ligor teorîya xwe ya "utengano" bi nav dike. Utengano dihête wataya bêxemî/xemsarîya hînbûyî. Yanê çi dibe çi nabe ne di xema wî/wê de ye, tenê jîyana rojane bo wî grîng e. Di hevtevna kurdî de mirov dikare van hundermend û stranbêjên arabesk biêxe vê kategorîyê, ku di navaxina wan de hesreteka tirkbûnê heye; jiber ku normên kulturî û civakî yên tirkî gerdûnî dibînin. Ev tak lihember norm û diyardeyên kulturî yên xwe (kurdî) bêxem in, lê gava ku pêdivî be, dikarin bi awayekê amrazî (enstrumental) taybetmendî yên kutlurî yên xwe - jibo ku xwe bi kultur û bihîzerên etnîsîteya serdest (tirk) bidine pejirandin - bi kar bihînin. Stranbêjekê arabesk dê muzîka kurdî bi kar bihîne, teksteka tirkî lê bar bike û bi aksaneka kurdî bi lêv bike. Guhdarên wî dê wî wekî ekzotîk pênase bikin, di heman demê de dê resenê kurdî yên wê muzîkê înkar bikin. Hunermend dê rola xulam yan axayê kurd bileyîze da paşkeftîbûna civaka kurd nîşanî kultura serdest bide. Kultura wî bixwe devasyon e; hilberîna vê berhemê jibo mukumkirina pozîsyona gerdûnî ya kultura serdest e.

BEDPERWERDE Û MENTÎSÎDA KURDAN

Bedperwerde yan bi inglîzî mis-education têrmek e, ku dîronnigarê reş Carter G. Woodson (1933) jibo şirovekirina bandora têkder liser hişê reşan di sîstema perwerde û pedagojî û mufredatan de liser wan hîştîye, afrandîye. Heger em vê teorîyê li ketwarê bakur peyrew bikin, pedagojî û mefredatên sîstema perwerde ya osmanî û komarê bi qest mîrasa kulturî û edebî ya kurdan jê birîye, tehrîf kirîye yan mesxere kirîye. Di haletê herî baş de kurd wekî gelekê bê medeniyet hatîye wesif kirin, ku tenê xwedîyê hindek edebiyata devkî ye. Geşestandina entellektuel ya kurdan di xwandegehên fermî de hatîye desteser kirin. Jiber ku armanca vê perwerdeyê "mentîsîd" e, ku Bobby Wright cara yekem ev termînolojî bi kar anîye. Mentîsîd hingê rû dide, gava ku mirov (kurd) dilxwazane ligor tefsîra kesên din (tirkan) realîteyê disêwirîn û ligor wê sêwirandinê tev digere; hizr û tevgera ku di xêra wan kesên din (tirkan) de ye, lê berovajî beqa û mayîna mirovî bixwe (kurdan) ye. Wekî Wright dibêje ev rewşeka nepenî ya dînîtîyê ye. Giregirên kurd, çi entellektuelên modernîst û çi hin şêx û axayên, ku bûne hevkarên ittihatçîyan, kirdarên xwe di arasteya berjewendîyên efendîyên xwe lê li hemberî beqa û mayîna xwe û miletê xwe de encam didan. Ecêb nîne di encama vê perwerdeyê de mejîyê takê kurd ji pêçikê heta mirinê bi dezînformasyon, nîvrastî yan tamderewan derheqê gel, dîrok, kultur û hebûna gelê wî/wê bi xwe de hatîye hilkutan.

Kurdên Anatolya Navîn

Aramî û hizûr di berjewendîya me de ye

Zêdetir ji 400 sal e ji bi hezaran kurd ji bakurê Kurdistanê ber bi Anatolyayê hatine sirgûn kirin. Wan nasnameya xwe û zimanê xwe parastîne. Rewşenbîrên kurdên Anatolya Navîn aşkere dikin ew jî digel wê yekê ne hizûr û aramî li Tirkîyê peyda bibe.

GÖNÜL GÜN

Di sala 2013an de di navbera Tirkîyê û PKKê de bo sekinandina şer û çareserîya meseleya kurd pêvajoyekê dest pê kir. Di vê pêvajoyê de gelek caran di navbera terefan de hevdîtin çêbûn. Piştî demekê di encama hevdîtinan de bi navê'Dolmabahçe Mutabakatı' (Peymana Dolmabahçeyê) hat rave kirin. Piştî ku Serokkomarê Tirk Recep Tayyip Erdoğan got'ez peymanê nas nakim û pirsa kurd tune ye' û PKKê li navçeyê Ceylanpinarê kuştina 2 polîsan li xwe girt hevdîtinên bo çareserîyê bi dawî bûn û heman demê şer dest pê kir. Di şer de gelek bajar û warên kurdan hatin xerakirin. Di encama van pevçûnan de bi hezaran mirov canê xwe ji dest dan. Nêzîkî 500 hezar kurd kurd li welatê xwe bûn koçber. Bi hewldana derbeya leşkerî ya 15e Tîrmehe jî ve proseyeka din li Tirkîyên dest pê kir. Herî dawî li parlamentoye bi piştgirîya AKP û MHPê biryara referandume hat dayîn. 16ê Nîsanê wê referandum bihêete kirin. Niha di rojeva de nîqaşên li ser pergala serokatî û hilbijartinên referandume hene.

Referandum di nav gelê kurd de jî dihête axaftin. Jiber hin sedeman kurd an koç kirine an jî sirgûnî Anatoliaya Navîn bûne. Serjimarîyeke zêde kurd li Anatoliaya Navîn dijîn. Kurdên li wir rojeva kurdan jî ji nêz ve dişopînin. Heftenameya Basê derheqê mijaren pêvajoya çareserîye, şerên dawî û bo referandumê bi kurdên Anatoliaya Navîn re axivî.

Rewşenbîr, sîyasetmedarên kurdên Anatolya Navîn aşkere dikin ku ew jî dixwazin aramî û hizûra serdema proseya çareserîyê li Tirkîyê peyda bibe û tirs û xofa nava gel derkeve.

"Kurdên Anatoliaya Navîn ji ber şerê dawî li ber xwe ketin."

Sînameger Fatin Kanat dest nîşan dike ku kurdên Anatoliaya Navîn hevdîtinên aştîyê û şerê dawî ji nêz ve wekî temaşevan dibînin û wiha axivî; "Kurdên Anatolya Navîn jiber şerê dawî xemgîn bûn. Li alîyekî ve wekî kurdên li bajarên mezin bi tirs dijîn. Jiber ku her ku diçe li dijî kurdan nîjadperestî û êrîş zêde dibin."

Sînameger Kanat, amaje dike ku kurdên Anatoliaya Navîn xweyî fikr û ramanên cuda ne. Jiber vê jî di referandumê de nêrînên cuda derkevin, Kanat wiha domand;

"Ez wisa dibînim ku kurdên Anatoliaya Navîn ji tiştên diqewimin ne kêfxweş in. Ji ber vê jî dibe ku di referandumê de piranî bibêjin 'Na'. Ji bilî wê niha liser gel pêvajoyeke xeternak heye. Gel di metirsîyê de ye ku gelo dê encama referandumê aramî bîne an jî alozîyê bîne. Yanê ev yek bibe ihtîmal ku gel dema biçe ser sindoqan di bin tesîra vê yekê de bimînin. Bi ya min encama referandumê an 'erê' an jî 'na' be jî bo kurdan tiştek naguhere. Jixwe kurdan derbe heta niha xwarine. Parlamenter, şaredar û gelek kes niha di zindanan de ne. Dewsa şaredaran qeyyûm anîne. Lê bi ya min her çi be jî bo demokrasî, azadî û mafên mirovan bibêjin 'Na' baştir e."

"Kurdên Anatoliaya Navîn perçeyekê gelê kurd in "

Cihgirê Serokê Giştî yê PSK(Partîya Sosyalîst a Kurdistan) Hasan Tuzcu, dibêje ku kurdên Anatoliaya Navîn yek jî perçeyên gelê kurd e û Tuzcu wisa axivî;

"Piştî ku ji Kurdistanê kurd hatin derxistin û sirgunî Anatolya Navîn bûn. Çanda xwemalî, fikr, hest û dîroka kurdên Anatoliaya Navîn dîyar dike ku ew perçeyekê miletê kurd in. Piştî du sed salî kurd hêj jî li dijî asîmîlasyonê xwe parastine û xweyî li çand û zimanê xwe derketine. Ev yek tê wê maneyê ku kurdên Anatoliayê qedera xwe di nav qedera kurdên Kurdistanê de dibînin. "

Tuzcu dîyar dike ku maneya referandume bo bidestxistina mafê kurdan yên kolektîf her wisa bo standardên demokrasîyê baştir bike, nîne. Tuzcu dibêje jibo kurdên Anatoliaya Navîn jî referandum heman mane de ye û wiha diaxive;

"Qet şik têde tune ku pirsgirêkên ku li Tirkîyê rû didin ji fam û fereseta Tirkîyê ya milîtarîst, yekrengî û înkarê pê dihêt. Ev taybetîya vê dewletê ye ku xwe di zagonên bingehîn yên di salên 1924, 1961 û 1982an de parastîye. Ev zagona bingehîn a dawî de heta niha 17 caran guhertin çêbû lê hêj di zagona bingehîn de reformên baş nehatîye kirin. Ev 14 sal in ku AKP desthilatdar e soz dabû gel lê hej zagoneke bingehîn a demokratîk çênekir. Îro di 18 bendan de ku biçe referandumê alîyekê erênî tune ye. Ji alîyê din ve pêşnûmeya heyî di pergalê de dibe ku krîzên nû derxîne holê. "

"Kurdên Anatoliaya Navîn her tim xwe bi tenê hîs kirin"

Endamê Meclîsa Partîya HDPê (Partîya Demokratîk a Gelan) Hacı Mehmed Bozdağ eşkere dike ji ber ku kurdên Anatolya Navîn rastî êrîşan hatin, herî dawî di ser avahîyên partîyan de girtin, teqînen ku hatin kirin dikevin nav metirsîyê. Bozdağ derheqa vê mijarê de bi vî awayî nêrînen xwe anîn zimên;

"Kurdên Anatoliaya Navîn her tim xwe bi tenê hîs kir û ji xwe tirsa wan ji berê ve heye. Yanê xwe di nav okyanûsê de wekî giraveka piçûk dibînin. Em bûn şahid ku kurdên Anatolyayê xwe di pêvajoya çareserîyê de aram hîs dikirin."

Bozdağ rave dike ku li gorî ditînên wî di referandumê de kurdên Anatoliaya Navîn zedetir wê dengên 'na' bidin. Bozdağ got ger li pêşîya wan zêde astengî neyê dayîn ew ê jibo referandumê amadehîyeke baş bikin û bi awayekê baştir gel serwext bikin.

"Ez wisa difikirim ku di referandumê de zedetir dengên 'na' derkevin"

Rêvebirê Navçeya Balaya Enqereyê a HDPe Osman Konukçu amaje dike hevdînen bo çareserîyê tecrûbeyên girîng bûn lê piştî van hevdîtinan, şerê ku dest pê kir serdemeke dijwar pêk anî û wiha dewam kir.

"Pevajoyên aştî her carî cuda nin. Niha ti kes zirarên şer û pevçûnan naxwaze. Em aştî û biratîyê dixwazin lê em naxwazin mafên me jî bê bin pê kirin dîsa em dixwazin nasnameya xwe biparêzin. Ez wisa difikirim ku wê di referandumê de zedetirîn dengên 'na' derkevin."

ÇETİN TAŞÇI: DIVÊ EM KEDA XWE JIBO KURD Û KURDISTANÊ XERC BIKIN

Çetîn Taşçıyê ku Pisporê Xizmetên Civakî ye dest nîşan dike dema ku pêvajoya çareserîyê hebû sawên kurdên Anatoliayê hindik bibûn. Metirsîyên wekî kuştin, binçavkirin, ketina girtîgehê êdî nemabû û wisa diaxive;

"Her çendî şer li bajarên kurdan bibe jî ev yek li jîyana kurdên Anatoliayê jî tesîr kir. Zedeyî dewleta Tirkîyê sedema vî şerî dawî ye. Ji alîyê din ve ti kes bi awayekê eşkerê xeteyen PKKê nabêjin. Ez wisa bawerdikim û difikirim ku kesên ku nezî PKKê ji vê rewşê ne razî ne. Le belê tu tişt ji destê van jî naye."

Taşçı derbarê referandumê de wî nêrînên xwe wiha anî ziman;

"Her çi qas ev referandum bo kurdên Bakur ne grîng be jî bo kurdên Antolyayê girîng e. Li gorî naveroka referandumê cudahîya hêzan an bikeve bin kontrola kesekî an jî dê bikeve bin tesîra kesekî/ê. Pergala serokatî ne pergaleke xirab e lê ne Tirkîye, ne AKP, ne jî Erdoğan bo vê pergalê amade nîn in. Yanê ev tişt wê bi kerî fikra Osmanîya Nû bê. Jiber vê yekê jî ev referandum dê liser jîyana kurdên li Anatolyaya Navîn tesîr bike. Liser boykotê jî ez bibêjim, ligor min boykot jî awayekê 'erêkirinê' ye.

Taşcı bi vê gotinê dawî li axaftina xwe anî; "Divê em keda xwe ne ji bo demokratîzekirina Tirkîyê, zêdetir bo kurd û Kurdistanê xerc bikin."

ELÎDA ZERRÎ

“Xetaya Homayî”

TARÎXÊ dinya de her wext kam ke bîyo wayîrê îqtîdarî nêçarî pelexnayî. Maseya girde her wext maseya qickeke werda. Ma nê sistemî ra vanê hîyerarşî. Eke yew ca de hîyerarşî estbo wayîrê hêzî zî esto, bêquwet zî esto. Labelê edalet çin o, çimkî eke yew ca de kesêko binê zulm, zext û kolonîzatorîye de bibo merdim nêeşkeno uca de estbîyayîşê edaletî ra behs bikero. Kolonyalîzm dewro verên de zî estbî. Raşt o, estena merdîmîye ra nata îqtîdar û kolonyalîzm kêmî nêbîyê. Hakimîyetê însanan teyna însanan ser o çin o her çî ser o esto. Însanan hem yewbînî rê zext û zulm kerdo hem zî zerar dayo tebîet û heywanan. Beno ke Homa zî poşman o. Nêbo ke şima vaje estafrillah. Semedo ke însanî xeliqnayî, xetayêka pîle kerda Homayî. Meleka Tawus o wext zanaybî û aye ra verê Ademî de secde nêkerdbî. Xora Homa zî dima poşman nêbîyenê Ademî surgunê dinya nêkerdêne.

Ez bawer kena ke, însanî bîyê belayê sereyê dinya. Adem wexto ke cenet ra surgun bîyo û ameyo dinya, dinya ameyîşê ey ra dima hêdî-hêdî bîya cehenem. Ez nêzana; Homayî ceza daye Ademî yan da dinya? Însanî dinya ser o senî ke peyda bîyî a roje ra hetanî nika tira werda.

Însun ameya dinya û hetane înkê tira werda. Însanan pêro dinya kerda kolonîze. Tabîet û heywanî destê însanan de kewtî bela. Însanan tabîet binê ra talan kerd, pêro darîstanî çin kerdî. Înan her ca de keyeyî viraştî, ma êdî nêeşkenê kerra û betonan ra teber çîyê bivînê. Dar nêmendî, daristanî çin bîy, awî ancîyayî... Coka hem cîfe ma hem zî cîfe dinya nêvejîyeno. Ro/çem û dengîzî ridê însanan ra bîyî qilêrin yan zî bîyê ziwa. Eşteyanê fabrîqayan û çopanê însanan pêro maseyî merdî. Dûmanê fabrîqa û yê egzozanê wesayîtanê motorinan merdimî hînî nêeşkenê cîfê xo bigîrê. Hewayê ma bî qilêrin û jehrin. Merdimî coka hertim nêweş ê. Her kes bîyo astim û kanser. Awê ma de tehme nêmendo.

Ganî merdimî sey keyeyê xo wayîrê dinya zî bivejîyê, bêguman dinya keyeyê ma ya pêrune. Verê wextê sûrleçen (kızılderî) tebîet firaz bî. Çimê înan de ganê tebîetî estbî. Koyî, çemî û darî firaz bîyî. Labelê merdimê tensipîyî ameyî , koyî nêmendî, çemî nêmendî. Merdimê tensipîyî biquwet bîyî, her ca kerd kolonîya xo. Seke vîrusî her ca ra vila bibê ê zî vila bîy la reyna zî çime înan mird nêbîy.

Însan pîzepîl o, qet mird nêbena. Her çi ke rind o însanan o xirabe kerd yan zî çin kerd. Xora fitratê însanan zî wina yo; ê çimvêşan ê. Na çimvêşanîye do peynî de peynîya înan bîyara. Stephen Hawkîng vano ke “Hinî peynîya dinya ameya, peynîya însanan ameya. Homayî, Adem ardo dinya û Ademî zî verê cû Homa çin kerd, dima zî wazeno ke neslê xo çin bikêro. Eke wina şoro neslê însanan do zî çin beno û dinya zî.”

Ademî, peynîya xo bi destê xo ardo. Coka wezîfedarê NASA qet nêvindenê û cigêrayîşan kena ke bizanê merdimî eşkenê planetanê bînan de biciwîyê, gelo înan de şertê ciwîyayîşî estê yan çin ê? Nika NASA îdîa kena ke Mars de cuye esta, awe esta û goreyê nînan merdimî şênê uca biciwîyê. Însanî keyf kenê ke vanê ma hinî şonê Mars. Ma sereyê dinya werd, peynîya aye arde û ma nika zî dore ameya Marsî. Homa Mars rê ardim bikero.

Heywanê feqîrî zî zaf zulm vînenê deste însanan ra. Seba ke ma ca de banî viraştê, caye tebîî nêmendê. No semed ra tayê heywanî gest ra mirenê yan zî semedo ke pîzyê xo mird bikê yenê kewenê mîyane şaristanan. Labelê na rey zî însanî nê haywanan kişenê. Vanê xozî ameyî, vergî ameyî şaristanê ma istîla kerd. Raşta cin na ya ke însanan cayê heywanan îstîla kerd.. Naye ra mi cor ra va

Însanî kolonyalist ê, egoist ê.Kamî vato însan eşrefe mehluqatî yo. No vate zur o. Vanê însanî pîramîdê ekosîstemî de en cor de yê, înan ra pîlêr û muhîmêr yew çî çin o. Tebîet û heywanî semedê însanan xeliqnîyayê. Coka însanî bîyê kibrin, nê vateyî xo rê kerdo behane û xo wayîrê tekane yê dinya vînenê. Ê, bîyê efendîyê heywanan. Heywanî bêmudeafa yê. Raşt o sîleh û teknolojîyê însanan estê. Coka mîyanê înan de heyf ke seyyewbînîye çin a yanî seypê nîyê. Însanî her het ra zerar danê heywanan, tira wenê. Ma înan poste kenê û posteyê înan ra xo rê çenteyan û solan virazenê. Pirçê înan ra zî lihêfan û balişnayan virazenê. Goştê înan ma rê nêvejeno ser o zî ma het ra zerar danê înan. Heywanê feqîrî barê ma ancenê bes nîyo ser o zî m ara zulm vinenê, kuwayîş wenê. Labelê heyf ke nêeşkenê vera ma vengê xo bivejê û vernîya zulm û heqaretê ma yo ke ma înan rê kenê bigîrê.

Ma înan rê yew hepisxane viraşt û nameyê ey zî baxçeyê heywanan pana. Kapîtalizm, bi no hawa semedê pereyan heywanan dano mehkûm kerdene. Ma şonê uca û heywanan esîran temaşe kenê û keyf kenê û huyenê. Gelo no senî yew vîcdan o wina?

Ma merreyan, meymunan û kutikan ser o ceriban (deneyan) kenê, seba sihhetê xo heywanan çin kenê. Goreyê şima no edalet o? Qiymetê ganê heywanan ma het de qet çin o. Çimkî însan eşrefe mehluqatan o.

Ez reyna vana; însan pîzepîl o, mirdbîyayîş qet nêzano, egoîst o. Coka mi va Homayî Ademî rê ney dinya rê ceza daya. Ademî peynîya dinya arda, peynîya tebîet û ya heywanan arda. Dore ameya Marsî. Homa Marsî rê ardim biko!

FÎRUZE DEMÎR

Roja ciniyanê kedkaran ya cîhanî

8’ê adare 1857’î de şaristanê Amerîka New York de çewres hezar karkerê cinîyî ke fabrîqa çulagîye (dokuma; tekstil) de xebitîyenê wazenê ke şertê gureyayîşê înan bêrê rind kerdene, qandê co ya fabrîqaya tekstîlî de dest bi grevî kenê. Na fin polîsî hêrîşê karkeran kenê, karkeran kenê zereyê fabrîqa, berê aye gênê û dima zî fabrîqa veşnenê. Nê şewatî de bolê (zafê) ci cinîyî, 129 kesî veşenê, gan danê û bi no hawa mirenê.

Serra 1910î de şaristanê Danîmarka Kopenhang de pêşenganê demokratanê sosyalan ê Almanya ra Klara Zetkîn konferansê cinîyanê sosyalîstan de vana, qandê vîrardîşê kedkaranê ke a fabrîka de veşayê, wa qandê înan heştê adare bibo roja cinîyanê kedkaran ya dinya. Beşdarbîyayoxê konferansî pêro-pîya na pêşnîyaza Klara Zetkine qebûl kenê. 1921 de Moskova de konferansê cinîyan yê mîyanneteweyî de na roje sey roja cinîyanê kedkaran îlan bena. Pîrozkerdişê 8ê adare tayê welatan de wextê herbê cîhanî yê yewinî ra heta dîyine ame qedexe (yasax) kerdene. Senîke 8ê adare 1968 de Amerîka de qandê vîrardişê cinîyan aktîvîteyî benê, na roje o wext ra tepîya vîrê merdimayî de cayê xo gêna. Miletê Yewbîyayeyan, 1977 de 8ê adare sey Roja Cinîyanê Kedkaran name kerdo.

Tirkîya de 8ê adare tewr verî 1921 de ameya pîroz kerdiş. 1975î ra dima şar mîyan de hewna vêşî zanîyaya û kûçeyan û kolanan de ameya pîroz kerdene. Îdareyê darbeya leşkerî ya 12ê êlule çar serrî kerd qedexe û nêverda ke na roje bera pîrozkerdiş. Winî aseno ke 8ê adare Tirkîya de hetanî serranê peyênan bi goreyê manaya xoya esasine nêameya pîrozkerdiş yanî cinîyê kedkar û reşberî beşdarê nê merasîman nêbîyê. Cinîyê ke şewe ra heta şan hêgayan de bi zengenan gureyenê, peme, çay û findiqî arê danê, na roje ra bêhay û bê xebere bîyê. Eynî cinîyî ser o zî keyeyanê xo de karê keyeyî kerdê, ewnîyenê qeçekan ra û karane bînan kenê... winî-wina rojêk de 15 seatan vêşêrî gureyenê.

Kîşta bîn ra nê serran ra pey her kes vîneno ke cinîyê kurdan her serre hîna vêşî tewrê faalîyetanê na roje benê. Nînan mîyan de ê kê wende nîyê zî estê. Cinîyanê 20 serreyîyan ra bitepîşê hetanî yê 70 serreyîyan hemê tebaqayan ra cinîyê kurdî kuçeyan û kolanan de pîrozkerdişê na roje kenê şên. Ewro kurdî zî heme dinya de kotî ciwîyenê, uca pîrozkerdişê 8ê adare tena yew roje de ney temamê ê hewteyî de pîroz kenê. Ma vînenê ke tena welat de ney rojawanê Tirkîya û şaristananê Ewropa de zî cinîyê kurdî bi hawayo aktîf tewrê aktîvîteyanê na roje benê.

Di cinîyê sembolî

Derheqê mucadeleyê averşîyayiş û heq û huquqê cinîyan de belkî tewr verî nameyê di cinîyan yen oma vîr; Clara Zetkin yena, embaza ci Rosa Luxemburg. Ma bi kilmîye înan ra behs bikerê.

Clara Zetkîn

5ê temmuze 1857 de bajarê Saksonya yê Almanya de ameya dinya. 1874 ra tepîya Almanya de falîyetanê cînîyan û yê karkeran de ca gêna. Zetkîn perwerdeyê mamostatîye dîyo. Esas nameyê aye Clara Eissner a 1889 de waştîyê ci Ossîp Zetkîn mireno, badê mergê ey peynameyê ey girewto. Maya di lajan a

1878 de bîya endama Partîya Karkeranê Sosyalîstan ya Almanya (SAP) hetanî serra 1917î bi hawayo aktîf xebitîyaya. 1917î ra dima Partîya Demokrata Sosyalîste ya Xosere ya Almanan de (SPD) wezîfe girewto. Na partî de embaza ci Rosa Luxemburg reyde sey şorişgerê radîkalî hesibîyayê. La badê “Şewatê Reichstagchstag” A. Hîtler, na partî qedexe keno. Zetkîn zî hetanî peynîya emrê xo surgun de Yewîya Sovyetan de manena. 20ê Hezîrane 1933 de Moskova de mirena.

Rosa Luxemburg

Serra 1871de ameya dinya, Unîversîtêyê Zurîhî de beşanê felsefe,tarîx, polîtîka, ekonomî û matematîkî de perwerde girewto.1890 de seke Bîsmarck Hereketê Demokrasîyê Sosyalîstan qedexe keno peysergirewtişê na qanûn dima ra, Rosa Luxemburg zî sey Clara Zetkîn bena endama Partîya Karkeranê Sosyalîstan ya Almanya (SAP) fikrê aye kadroyanê sosyalîstanê Ewropa ser o tesîrêko pozîtîf keno. Wextê herbê dinya yê yewinî de fikrê Rosa Luxemburg û yê na partîye mîyan de cîyayî benê. 5ê temmuze 1914 de Karl Liebknecht’î ya pîya “Grûba Enternatîonalî awan kerda. 1ê çileye 1919 de hetê çeteyanê faşîstan ra bi pirodayiş û îşkence kişîyaya.

Kombîyayîşê Zaza-Derî

Komeleya Zaza-Derî ya ke kurdbîyayîşê kirmancan (zazayan) û kurdkîbîyayîşê kirmanckî (zazakî) înkar kena, 19 sibate 2017 de Anqara de yew kombîyayîş viraşt.

Zafê keyepel, rojname û televîzyonanê tirkan, nê kombîyayîşî ra bi sernuşteyê “Zazalar Ankara’da buluştu” behs kerd. Serekê Pêroyî yê Anadolu Köy Korucuları ve Şehit Aileleri Konfederasyonu Ziya Sözen, Serekê Beledîya Çewlîgî Yücel Barakazi û parlamenterê AKPyî Cevdet Yılmaz zî beşdarê nê kombîyayîşê bîyê.

“Zazacîyan” rê hetkarîya Serekê Konfederasyonê Korucuyan û parlamenteranê AKPyî çîyêko balkêş o. Çunke ma zanî ke hukmatê AKPyî na seserra 21. de nêverdano kurdî (çi zaza çi kurmanc) bi ziwanê xo perwerde bibî.

AKTUEL

Rêxistinê cinîyanê kurdan yê tewr verênî

MUTLU CAN

WENDOXÊ erjayeyî semedo ke 8ê Adare Roja Cinîyan yê Cîhanî no hewte yo ez wazena ma na hûmare de bala xo bidîme tarîxê hereketanê cinîyanê kurdan ser. Seke şima zî zanê cinîyan heme mucadeleyanê dinya de sey subje cayê xo girewto. Xususen tarîxê miletperwerî û raxelisîyayîşê miletanê bindestan de estena cinîyan zaf xurt a. Hende ke tarîxê her miletî de cinîyê ke bîyê sembolê azadîya ê miletî estê. Aye ra yo ke nê cinîyî hetê mensubanê miletanê xo ra bi hurmet û mînet ênê yadkerdiş. Çunke înan mucadeleyê raxelisîyayîşê miletanê xo de kedêka pîle werda; ge-ge rasterast canê xo daya ge-ge zî bi roşnaya çimanê xo, zanayîş û fedakarîya xo xizmetê awanbîyayîşê ruhê netewperwerî kerda; ge-ge zî averşîyayîşanê madî, fikrî û kulturîyan de rolê îstîsnayî kay kerdê. Çend nimûneyê ke na game ênê vîrê mi; tarîxê îngîlîzan de Boudica, yê fransizan de Jeanne D'Arc yê qirxizan de Kurmancan Datka ûsn. Helbet tarîxê şarê ma kurdan de zî cinîyê winasî estê; Zerîfe Xanim ra hetanî Mîna Qazî, Leyla Qasime ra hetanî Arîn Mîrxane belkî bi seyan cinîyê kurdî mucadeleyê raxelisîyayîşê kurdan de bîyê sembolê ruhê kurdperwerî û welatperwerîye. Bêguman heta ke dinya ser o kurdê ke qedrê mîrasê xoyê neteweyî, qedrê nasname û şerefê xoyê milî bizanê û ci rê wayîr bivejîyê estbê nê cinîyî do bêmerg bimanê û timûtim bi hurmet bêrê yadkerdiş. Çunke seke nuştoxo erjaye yo kurd Erebê Şemoyî vato; "Kesê ke emrê xo seba şarê xo vîyarnenê, ê xo vîr ra nêbenê." Ma nê qismî bi no qayde girê bidê û dest bi esasê mewzûyê xo bikê.

Kürt Kadınları Teali Cemiyeti Cemiyeti 1919

Komela cinîyanê kurdan ya verên a ke awan bîya Kürt Kadınları Teali Cemiyeti Cemiyeti (Komela Berzîya Cinîyanê Kurdan) ya. Na komele, 1919 de Îstanbul abîya û dest bi fealîyetanê xo kerda. Çend çimeyê ke derheqê abîyayîşê na komele de agahî danê ma, înan ra tewr muhîme Kovara Jîn a ke ê deman weşanê xo kena ya. Goreyê na kovare, bi munasebetê abîyayîşê komele yew kombîyayîş beno û tîya mewlîd êno wendiş. No kombîyayîş de bi nameyê Encûm Yamûlkî yew cinî, derheqê amancê awanbîyayîşê komele, şeklê xebata aye û rewşa kurdan de qiseykerdişêk kena. Ma yewna hûmara Jînî ra pêhesîyenê ke komele dest bi xebatanê ko kerda. Nêweşxaneyê Domanan yê Şîşlîyî de gelek domanê kurdî bê pere dana sunet kerdene û bi wesîleyê nê fealîyetî yew kayê tîyatroyî daya pêşkêş kerdene. Çîyo balkeş no yo ke çend roşnvîrê kurdan yê ê demî na komele û aktîvîteyanê aye rê bêreaksiyon nêmendê. Mesela nînan ra Azîz Yamûlkî pîyesê komele ser o yew nuşte nuseno û kovara Jîn de weşaneno. Ancîya çend hûmaranê kovare de tayê nuşteyê Memduh Selîmî ke babeta înan hem xebatê komele hem zî cinîyê kurdan ê yenê neşrkerdiş. Şaîranê kurdan ra Ebdurrehîm Rehmî bi munasebetê abîyayîşê na komele bi nameyê "Cıvata Dayikan" yew şîîre nuseno.

Derheqê na komele de yewna belge zî nîzamnameyê komele yo. Goreyê nê nizamnameyî ke bi nameyê "Kürt Kadınları Teali Cemîyetî Nizamnamesi" weşanîyayo, komele 1919 de Îstanbul de awan bîya. Yew noto ke qapaxê nîzamnameyî de ca gêno ra dîyar beno ke nizamname Dîvanyolu de Metbaya Kadınlar Dünyası de çap bîya. Kovara Kadınlar Dünyası Dergisi kovaranê cinîyan yê Cinîyanê Osmanî ra yew a. Bi no qayde fehm beno ke na komele û sewbîna komelanê cinîyanê Osmanî mîyan de têkilîyî estê. Nîzamnameyê Kürt Kadınları Teali Cemiyeti reya verêne 1986 de Îraq de hetê Abdulsetar Şerîfî ra, kitabêkê ey o ke babeta xo rêxistinê kurdan ê, tedeyê nê kitabî de çap beno. Nîzamname, 46 madeyan ra teşkîl beno. Semedo ke muhîm o ma çend madeyan ser o vinderê. Mesela madeya dîyine ya nê nîzamnameyî wina ya; [Amancê komele] Bi ferasetê modernî berzbîyayîş û averşîyayîşê cinîyanê kurdan temîn kerdene, cuya famîlyayan de reformanê sosyalanê bingeyinan kerdene, sêwî (sêwir) û vîyayê (dul) kurdan ê ke bi zorî koçkerdişan û kiştişan ver şertanê sefaletîye de mendê, înan rê kar dîyayene û ardimê nekdî (pere) kerdene û bi no hawa înan feqîrî ra raxelesnayene yo. Nê îfadeyan ra aseno ke hereketê ronşbîyayîşê komelê kurdan, ê wextan ra dest pêkerdo. Komele wazena ke hîrê tebaqayan rê xizmet bikero; muhacîran, sêwiran û vîyayan rê. Madeya hîrêyine de zî metodê xebata komele yenê îzahkerdiş. Cemîyet xo rê sey hedef tesbît keno ke sey rojname, kitab, kovare, broşur weşanan çap biko, mekteb û kitabxaneyan awan biko û aktîvîteyanê sey konferans û dersan organîze biko. Peynîya madeya çarine de bale ancîyena muhîmîya hîşyarbîyayîşê neteweyî ser. Madeya şeşine de îzah beno ke teberê cinîyanê kurdan de, cinîyê sewbîna miletanê ke hurmetê kurdan kenê, ê zî eşkênê bibê endamê komele. Ma madeya pancêsine ya nîzamnameyî ra fehm kenê ke îdareyê komele nê kesan ra teşkîl beno: Sereke, di hetkarê sereke, şeş endamê eslîyî, sekreter û kasadare. Winî fehm beno ke îdareyê tewr serên yê komelî de 11 cinîyî ca gênê. Nameyê awankerdoxê komele binê nîzamnameyî de nênusîyayo.

Encûm Yamûlkî
Hepsexana Neqib
Mîna Qazî

Ma cor ra vatbî ke sereka komele Dr. Encûm Yamûlkî merasîmê mewlîdî yê komele de qiseykerdişêk kerdo. Nika qismêkê qiseykerdişê aye neqlê cêrî bikîmê:

"Xanimêne ma kurdî îslamîyeto ke tewir bi tewir qewman kerdo wa û birayê yewbînan, peydabîyayîşê ey ra nata heskerdoxêkê tewr sadiq, dostêkê tewr bihêz û wa û birayêkê tewr bicoşî yê miletê tirkî yê. Ewro zemano ke ma tede yê de çarenuşteyê her miletî de vurîyayîşî benê û heq dîyeno her kesî, zemanêkê winasî de ma zî heqê xo wazenê, çunke ortê de bi mîlyonan kurdî estê û Kurdîstanêko pîl esto. Kesê ke wazenê bi hawayo tewr zêde seba hedefanê muqadesan bixebitîyê û sînayoxîya miletê xo bi fedakarîyanê xo îspad kerdê, ma bi heme wûcudê xo înan rê şukrankar ê. Xanim û wayê mayê muhteremî ke vaz dayî amey merasîmê abîyayîşê komele soz da ke bi her hawa desteg bidê û seba berzbîyayîşê kurdewarî çi lazim bo înan bê teredut bikê. Verî ra nata yew vateyê verênan ê kurdan esta vanê "kurd sozê xo ra anêgêreno" Ez bi qenaetê xo îman ana ke kurdî her çî rê soz nêdanê la wexto ke da zî sozê xo ra anêgêrênê."

Çend çîyê peyênî ke ma derheqê na komele de vajê nê yê; Na komele yew organê Kürt Tealî Cemîyetî bîya. Dr. Encûm Yamulkî û cinîya Şerîf Paşayo Kurdî Emîne xanime ronayoxê na komele ra yê û herçiqas melumato qetî ma dest de çin o zî goreyê texmînan her dîyinan zî serekîya na komele kerda. No mîyan de Encûm Yamûlkî kênaya Mistefa Paşayo Yamûlkî ya û îhtîmal o ke cinîya Azîz Yamûlkîyî biba. Orîjînê nîzamnameyê na komele ke osmankî ya tewr verî hetê Ethem Coşkunî ra transkrîbe bîyo herfanê latînkî û tirkîya ewroyine ser. [Gama ke mi no nuşte nuştêne mi meraq kerd ke gelo Ethem Coşkun kam o? Na babete ser o xebitîyayo yan nêxebitîyayo? Mi va eke xebitîyayo beno ke ez melumatanê ey ra îstîfade bika. Welhasil mi E. Coşkunî reyde bi telefon têkilî rona; O bi xo Anqara de yew sahafêko tirk o û pisporê osmankî yo. Qaso ke ez ey ra musaya no nizamname 1998 de, hetê R. Alakomî ra bi destê ey ameyo transkrîbe kerdene. Eleqeyê ey bi na cemîyet û nîzamnameyê ey hende yo] Ey ra dima keso dîyin o ke no nizamname transkrîbe kerdo herfanê latînkî û dima zî bi tirkî weşanayo mamosta Malmîsanij o. (b. Malmîsanij; "Kürd Kadınları Teali Cemiyeti Nizamnamesi (Nîzamnanmeyê Komeleya Berzîya Cinîyanê Kurdan)", Vate: kovara kulturî, hûmar: 10, Skärholmen /Sweden, Zimistan 2000, r. 72-77)

Komela Afratên Kurd 1930

Rêxistina cinîyan ya tewr verêne ya Kurdîstanê Başûrî "Komela Afratên Kurd" 28ê Hezîrane 1930 de pêşengîya Hepsexana Neqib de awan bîya. Hepsexana Neqîb kênaya Maruf Berzencî û datkênaya Kralê Kurdîstanî Şex Mehmud Berzencîyî ya. No teşkîlato ke hetê aye ra awan bîyo kîşta fealîyetanê xoyê sîyasalan de cînayanê kurdan mîyan de bîyo wasitayê piştîyayewbînangirewtişî zî

Hepsexana Neqib, eynî wext de abîyayîşê mektebê cînîyan yê tewr verênî de rolê pêşengîye (öncülük) kay kena. Heyf ke çi derheqê aye de çi derheqê na rêxistine de zaf çimeyî ke ma ci ra melumat bigîrê çin ê. Aye ra ma ancax eşkenê nê çend detayan neqil bikê; Hepsexana Neqib çarçewaya îmkananê xo de cinîyan rê hetkarîya ekonomî kerda û meselayê înanê sosyalî hal kerdê. Dîwanê aye semedê cinîyan rolê merkezê mişewre kay kerdo.

Yewîya Cinîyanê Kurdîstanî 1946

Yewîya Cinîyanê Kurdîstanî (Kürt Kadınlar Birliği), 14 adare 1946 de Komara Mehabadî de awan bîya. Heyf ke derheqê na rêxistine de zêde melumat nêrasayo ma. Qaso ke ma zanê hetê cinîya Serekkomarê Komara Mehabadî Qazî Muhammedî rehmetî, Mîna Qazî ra awan bîya û a serekîya ci kerda. Nameyê na rêxistine kurdan mîyan de sey şeklo corênî vila bîyo la nameyê raştkên yê na rêxistine eslê ci de no nîyo. Nameyê aye verî "Yekîtî Yayan" (Yewîya Xaniman) bîyo" [eslê ci de manaya "yay" sey ya kirmanckî ya; yanî bi tirkî teyze û anne ya la manaya pêroyî de sey "xanime" yena xebitnayîş] No name peycû êno vurnayîş û beno "Yekîtîya Jinên Demokrat ên Kurdistanê" (*) [Yewîya Cinîyîyanê Demokratan ya Kurdîstanî]

Hûmara 10. ya Rojnameyê Kurdistan Pressî de roportajêko Mîna Xanime reyde ameyo kerdene neşr bîyo. Ez nê roportajî ra qismo ke mewzûyê ma reyde eleqedar o, tirkî ra açarnena û neqil kena; "Ez o wext sereka Yewîya Cinîyanê Kurdan bîya. Cinîyê ke Mehabad û sewbîn mintiqayanê Kurdîstanî ra ameybî, ê zî a roje Rasteyê Çarçira de kom bîbîy. Şar pêro-pîya zaf şa bî..." Mîna xanime muhîmîyet dayo perwerdeyê cinîyan û semedê înan merkezê perwerdeyî ke tede bieşkê perwerdeyê wendiş û nuştişî bigîrê akerdê... Bi kilmîye a çi dewrê Komara Kurdîstanî de çi ey ra dima seba averşîyayîşê cinîyanê kurdan xebitîyaya.

(*) Çimeyê nê melumatî no yo; http://www.historyofkurd.com' o. [Nê keyepelî de 11 çîmeyî sey referans nîşan dîyayê] Semedo ke no melumato muhîm sorankî ra açarna û neqlê mi kerd mamosta Behrooz Shojaî rê sipas.

Çimeyê ke ci ra ame îstîfade kerdene nê yê:

Alakom, Rohat, Eski İstanbul Kürtleri, Avesta Yayınları, İstanbul, 2012

Malmîsanij; "Kürd Kadınları Teali Cemiyeti Nizamnamesi Nîzamnanmeyê Komeleya Berzîya Cinîyanê Kurdan)" Vate: Kovara Kulturî, hûmar: 10, Skärholmen /Sweden, Zimistan 2000

"Kadı Mıhammed'in Eşi Mina Xanim: O Günü Yüz Yıl Anlatsam Bitiremem", Kurdistan Press: Rojnameya 15 Rojîn / 15 Günlük Gazete, Hejmar/ Sayı: 10 (Ocak 1987), Sundbyberg [Swêd]

http://www.radikal.com.tr/yazarlar/ayse-hur/mayan-hatun-zarife-hanim-ve-mina-hanim-1180243/

http://zagrosname.com/blog/2016/02/27/475/

NADÎRE GUNTAŞ ALDATMAZ

"Mehelî û kırmanckîya înan"

Raya verêne serra 2013yî de tezê min ê masterî ameybî qebulkerdiş. Rasta xo mi no tez peynîya serra 2012yî de qedenaybî la şewirmendê tezê mi kirmanckî nêzanayêne. Coka nêşîkîyay nê tezî bi hewayo resmî qebul bikerê. Dima mamosta Malmîsanij ke unîversîte de dest bi gurîyayîş kerd o wext tezê mi wend û dima ame qebulkerdiş. Ancî zî tezê mi, bî tezê kirmanckî yo verên. Seba ke akademî de, gama verêne bi tezê mi erjîya, ez tim zerrîweş a, tim bextîyar a.

Xebatê akademîkî, nê tezî ra dima zî zaf bîy. Zaf meqaleyî ameyî nuştêne, tayê tezî ameyî qebulkerdiş. Tezê masterîyo kirmanckî yo bîn o ke kewto mi dest yê Pinar Yildize yo. Nameyê tezê aye "MEHELÎ Û KIRMANCKÎYA ÎNAN" a. Şêwirmendê tezî mamosta Malmîsanij o, tez 30.12.2016 de yanî aşmê ra aver ameyo qebulkerdiş. Leyê xususîyetanê bînan de no tez çend hetan ra zaf muhîm o: Bi kirmanckî yo, yew cinîke nuşto û Mehelî û kirmanckîya înan a ke heta nika tolde de (sîye de, nimite) menda, veta, arda kerda mîyanê xebatanê akademîkan. Ez texmîn kena ke zaf kes sey mi nameyê Mehelîyan newe pêhesîno û newe vîneno ke mintiqaya Qerecdaxî de zî kirmancî estê.

Mahîyetê tezî, seke nameyê ey ra zî yeno fam kerdene Mehelî yê û tez cewabê nê persan cigêrayeno. Eşîra Mehelîyan kam a, kotî ra ameya, kirmanckîya înan senên a, kamcîn mintiqa de ciwîyenê, çira ameyê ê cayan, çend dewê xo estê, mabênê xo de xobixo çitur name kenê ? ûsn. Nuştoxe, vateyo verên yê xebata xo de nîya vana: "Ma na xebata xo fekêkê kirmanckî yê 'nimite'yî ser o kerde. Yanî fekê kirmancanê ke mabênê qezaya Çinarî ya Dîyarbekirî û qezaya Dêrike ya Mêrdînî de yê ser o, bi vatişêko bîn fekê kirmancanê derûdorê Qerejdaxî ser o kerde… Ma na xebata xo de hem eşîra mehelîyan daye naskerdiş hem zî ziwanê înan ser o vindetê û ziwanê înan ra çend tekstî pêşkêş kerdê."

Beşo yewin yê tezî de, binê sernuşteyê "Dewê Kirmancan yê Qerejdaxî" dewê Çinarî û dewê Dêrike, ê ke şarê xo kirmanc o name bi name bi nufusê înan nuşto. Eşîra Mehelîyan dewe bi dewe da nas kerdene. Dewê ke Mehelî nîyê la kirmanc ê, ê zî dayê naskerdene. Şarê dewan de qisey kerdo, tarîx û kamîya înan pers kerda û cewabê dewijan nuşto. Tîya de çend çîyê ke balkeş ê û dîqetê mi anto, înan ra yew zî dewa Herbelî ser o vatişê dewijan bî. Mehelîyê ê cayan şarê dewa Herbelî, Mehelî nêhesibnenê. Vanê, ê dêrsimij ê. Gorê înan nê dewijî Dêrsim ra ameyê Sêwregi, uca ra zî bar kerdo ameyê dewa Herbelî.

Mehelî ewro bawer kenê ke kalikê înan mintiqaya Çewlîgî ra panc sey, şeş sey serre aver ameyê. Kalikê înano verên Çebaxçur ra ameyo Qerejdax. Gorê dewijanê ê hetan gama ke kalikanê înan mintiqaya Çewlîgî ra bar kerdo û vila bîyê, seba ke yewbînî vîndî nêkerê yew parola tesbît kerda. Parolaya xo kurmanckî ya û gorê nuştoxe, tayê mehelî vanê, kesê ke na parola nêzanê ma ra nîyê. Nuştoxa xebate, parolaya Mehelîyan nîya neql kerda: "Şeva reş, şûva reş, mîya qer, berx li ber". Manaya aye: "Şewa sîyaye, şûva sîyaye (filhano sîya), mîya qere (mêşnaya qere), verek ver de (kavir ver de)."

Parola çayê kurmanckî ya? Cewabê nê persî mi nêdî. Henî aseno ke a mintiqa de xora her di ziwanî kî kewtê têmîyan. Tayê kirmancî êdî kirmanckî qisey nêkenê, eslê xo kirmanc o la kurmanckî qisey kenê. Beno ke eslê tayê kirmancan zî kurmanc bo. Coka parolaya xo zî kurmanckî ya. Çîyo ke bala mi ante kurmanckî bîyayîşê parola nîyo. Estbîyayîşe parola bi xo yo. Her çiqas ke manaya parole mota mot "Xo vîrî ra meke!" nîyo zî estbîyayîşê parola eynî wext de yeno na mana. "Xo vîrî ra meke!" ke ti kam a, kam ca ra yena?

Mehelîyan çirê herema Çewligî ra bar kerdo? Cewabê înan cîya-cîya bo zî nêzdîyê yewbînan ê. Henî yeno fam kerdene ke, eslê meselaya barkerdîş yewbînan de xeyr nêkerdene bîya.

Beşo dîyin yê tezî de vîndîbîyayîş û vurîyayîşê vengan yê kirmanckîya Mehelîyan ameyo nusîyayene. Vengê ke nameyan, karan, sifetan ûsn. de bîyê vîndî yan zî vurîyê bi nimûneyan îzah bîyê.

Çarçewaya na xebate de nuştoxe di tenî zî xerîtayê mintiqa viraştê û dewê kirmancan serê xerîta de îşaret kerdê. Qiseyê aye yo peyên ra: "Dew û mezrayanê kirmancan (zazayan) yê na mintiqa ra 44 hebî resmîyet de girêdayeyê qezaya Çinarî yê. Nê 44 heban ra tena şarê dewa Herbelî (Kuyuluhöyük) eşîra mehelîyan ra nîyo. Heşt dewê kirmancan resmîyet de girêdayeyê Şaredarîya Rezan ya Dîyarbekirî yê. Nînan ra 3 hebî dewê eşîra mehelîyan ê, 5 hebî zî eşîra mehelîyan ra nîyê. Dew û mezrayanê qezaya Derike ra 28 hebî, yê mehelîyan ê. Yanî 80 dew û mezrayê kirmancanê derûdormeyê Qerejdaxî estê. Nê dew û mezrayan ra 74 hebî, yê eşîra mehelîyan ê."

nadirega@hotmail.com

Ronakbîrekî jibîrkirî:

Mehmed Mîhrî Hîlav

FEXRÎYA ADSAY

Hîlav li Stenbolê ku destpêka sedsala 20an de gelek ronakbîr û xwendekarên kurd ên ji gelek deverên Kurdistanê li hev civîyane, di nav kar û xebatên çandî yên kurdan de cî digire. Di rojname û kovarên Rojî Kurd, Hetawî Kurd, Jîn, Hetawî Hewlêr û Kurdistanê de li ser babetên curbecur bi kurdî û tirkî dinivîsîne.

Di lîteratura ronakbîrîya kurd de kêmbûn/tunebûna bîyografîyên têrûtijî û berfireh yek ji kêmasîyên sereke ye. Bîyografî dikare rê bigre liber jibîrkirina kesayetên di dîroka neteweyekê de keda wan heye an li çand û dîroka neteweya xwe zêde kirine. Wek şaxeke zanîna dîrokî jî mirov dikare li bîyografîyan binêre. Jiber ku şexsîyetên navdar an berhemdar ligel qabilîyetên û zîrekbûna xwe berhemên peywenda çandî, sîyasî, aborî hwd. a dewra xwe ne jî. Mirov dikare di neynika jîyana şexsekî re bi giştî li serdemekê binêre, fam bike, liser bifikire û wê şîrove bike. Lewma dikare zanîna me ya derbarê rabirdûyê de kûrtir û berfirehtir bike.

Wek mînak mirovekî wek Celadet Alî Bedirxan ku belkî sîmayê zêdetirîn naskirî yê ronakbîrîya kurd e, agahîyên derbarê wî de hê jî ne liser hev in. Herwiha Şêx Seîdê ku ew jî yek ji navdartirîn şexsîyetê kurd ê sedsala 20an e, em ji berhemeke bi rêkûpêk liser jîyana wî bêpar in. Em nizanin ka şexsîyet û nasnameya wan a ku îro pê tên naskirin çawa şikil girt, çiqas jê bandora malbata wan bû an derdora wan a zaroktîyê bû, çiqas jê bandora perwerdeya wan, xwendinên wan, mamosteyên wan bû. Halûmercên wê dewra wan çawa berê jîyana wan guhert an ew bixwe di kîjan merhaleyan re derbas bûn? C. A. Bedirxanê em bi kovara Hawarê nas dikin û yê bîst sal berîya wê gelo çiqas dişibin hev? Di xortanîya xwe de, dema çavê wî li dinyayê vedibû di bin bandora kê de ma? Şêx Seîd berîya 1925a çi dikir? Zaroktî û xortanîya wî di derdoreke çawa de derbas bû? Bi kê re dida û distend? Ew di kîjan merheleyan re derbas bû heta ku bû pêşengê serhildaneke ewqas girîng? Pirs gelek in. Her çiqas bersiva hemû pirsan belkî wê tunebe jî, pirs û lêgerina bersivên wan bixwe jî dikare bi serê xwe asoya mirov firehtir bike. Helbet her bersivek wê bibe kevirek di hîmê zihna me ya derheqê rabirdûyê de.

Yek ji ronakbîrên kurd ên destpêka sedsala 20an e ku heta niha kêm hatîye naskirin Mehmed Mîhrî Hîlav e. Bi saya xebata Seîd Veroj (Mehmed Mîhrî Hîlav û Kovara Kurdistan, İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları, 2015) Hîlav ji kêm ronakbîrên kurd e ku êdî bîyografîya wî heye û agahîyên derbarê wî de di pirtûkekê de li ber dest in.

Mehmed Mîhrî Hîlav kî ye?

Hîlav bi eslê xwe ji Rojhilata Kurdistanê ye û di 1885an de li gundê Deşîyê ya bi ser bajarê Sinê ve hatîye dinyê. Di zaroktîya xwe de bi zîrektîya bal kişandîye û li bajarên Bîcar, Sinê, Serdeşt û Hewlêrê xwendina medreseyê temam kirîye û îcazeta melatîyê wergirtîye. Piştî vê jî rêwitîya wî naqede, tê demekê li Wan, Qers û Erziromê jî dimîne û sala 1911ê de derbasî Stenbolê dibe û carek din venagere Kurdistanê. Li vir digel Medreseya Fatihê, Fakulteya Hiqûqê jî xilas dike. Di heman medreseyê de dersên erebî, farisî, gramer û felsefeya dînî dide. Piştî sala 1921ê, wek yekemîn parêzerê dest bi parêzerêyê jî dike. Ji bilî zimanê xwe kurdî zimanên tirkî, erebî û farsî û edebîyata wan jî baş nas dike qasî ku li ser wan binivîsîne û mamostetî bike.

Li Stenbolê xemxur û ramangerekî kurd

Hîlav li Stenbolê ku destpêka sedsala 20an de gelek ronakbîr û xwendekarên kurd ên ji gelek deverên Kurdistanê li hev civîyane, di nav kar û xebatên çandî yên kurdan de cî digre. Di rojname û kovarên Rojî Kurd, Hetawî Kurd, Jîn, Hetawî Hewlêr û Kurdistanê de li ser babetên curbecur bi kurdî û tirkî dinivîsîne. Bixwe xwedîyê kovara Kurdistanê ye ku sala 1919an dest bi weşanê dike. Ji xeynî gotarên di kovar û rojnameyan de nivîskarê çar pirtûkan e ku bi zimanê tirkî hatine nivîsandin. Yek ji van Muqeddimet-ûl Îrfan e ku yek ji xebatên berdest ên ewilîn û sereke ye derbarê fonetîk û zaravayên kurdî ye. Piştî serhildana Şêx Seîd wek ronakbîr û çalakvanên din î kurd ji ber îstîbdada rejima komara nû-ava êdî di nav ti çalakîyan de xuya nake Mehmed Mîhrî. Piştî şer bi ronakbîrên wek Musa Anter, Seîdê Kurdî û xwendekarên ji nifşê nû dikeve têkilîyê. Di Dicle Kaynağı ya Musa Anter de dinivîsîne, alikarîya madî ya komeleyên xwendekarên kurd dike hwd. Di pirtûkê de dîyar e Mehmed Mîhrî bi taybetî di warê rewşa çand û zimanê kurdî de xemxurek e û her dem xwestîyê tevkarîya pêşketina kurdan bike. Derbarê ramanên wî, gotar û pirtûkên wî agahîyên berfireh hene di pirtûka Seîd Veroj de lê ya girîng dema mirov vê pirtûkê dixwîne rê li ber kîjan hest û ramanan vedike gelo?

Têkçûn, windabûn

Portreyê giştî yê Mehmed Mîhrî, ya rast, portreyeke giştî ya piranîya ronakbîrên kurd ên sed û pêncî salên dawî ye jî. Destpêkê de li Stenbolê wek kurdekî zîrek, bi hewes û serkeftî bi saya nav şert û mercên dewra xwe bi gelek meseleyên sîyasî û çandî yên derbarê kurdan re serê xwe dieşînî, dinivîsîne, weşangerî dike, dibe ramangerekî dewra xwe. Wek endamekî neteweya xwe di warê çandî de çi destê wî dike. Piştî avabûna Komara Tirkîyeyê bayê felekê li wan dixe ronakbîr û çalakvanên kurd ên li Stenbolê ji hev belav dike. Ji ber îstîbdada rejima nû êdî bi her awayî cî ji xebatên çandî re û derbirîna kurdbûnê namîne; hin ji wan hemû hêza xwe didin xebatên sîyasî, serî hildidin, tên kuştin an sirgun dibin. Encam têkçûneke xedar e. Ên dimînin xwe bêdeng dikin, ji kurdabûna direvin an didin jibîrkirin. Wekî din ti çare nîne.

Mehmed Mîhrî ku li Stenbolê dimîne, herçiqas em ji têkilîyên wî yên salên 1950yan derdixin ku kurdbûna xwe ji bîr nekirîye jî, ew di xwe de veşartîye, qet derbasî zarokên xwe nekirîye. Em dibînin zarokên wî heta piştî mirina wî jî haya wan ji nivîsên bavê wan î bi kurdî tuneye. Dema xalê bavê wan ji Kurdistanê tê û bi wî re dipeyive dengê kurdî dibihîzin. Bavê wan di 20 salîya xwe de fêrî tirkî bûye û lê zarokên wî peyvek kurdî nizanin. Ji kurtejîyana wan xuya dike Mehmed Mîhrî, ku ramangerekî kurd î navdar bû berîya salên 1920an, ew wek tirk mezin kirine. Ji bilî kurdbûna xwe hemû zanyarîya xwe bi wan re parve kirîye ew û gelekî baş gihandine. Bi taybetî yek ji kurên wî Selahattin Hîlav wek doktorê felsefeyê dibe şexsekî naskirî di nav ronakbîrên tirk de. Bi berhemên xwe û wergera gelek berhemên sereke li ronakbîrîya tirka gelek tişt zêde kirîye. Kurê din Necmeddîn Hîlav, her çiqas berhemên wî nivîskî tunebin jî, ew wek bengînê xwendin û pirtûkan mirovekî naskirî bûye... Bi kurtasî, kok û hafizeya Mehmed Mîhrî ya kurdbûnê hişk dibe, derbasî nifşê nû nabe.

Mehmed Mîhrî mînakek e ku zîrektî û berhemdarîya mirovan çawa dikare bêyî îradeya wan ziwa bibe, li ber bayê biçe. Mirov difikire ger bi komara Tirkîyeyê re dewleteke kurd jî ava bibûya bi ihtimaleke mezin ew ê bibûya burokrat an ronakbîrekî mezin; ji alîyê nifşên îro jî bihata naskirin; berhemên wî di dibistanan de bihata xwendin. Ya girîngtirîn mîrata xwe ya çandî wê karibûya derbasî zarokên xwe jî bikira û bidaya dewamkirin. Wê îro tenê ji alîyê çend lêkolînerên kurd ve nehata naskirin. Zarokên wî tevî mîrata wî nedibûn milkê tirkan...

Sedsal berê û îro

Sedema ku serpêhatîya Mehmed Mîhrî îro dilê mirov diêşîne ew e ku rewşa ronakbîrên kurd pir zêde neguherîye. Rewşa sîyasî û çandî îro li bakurê Kurdistanê di nav têkçûneke din de ye. Gelek sazî û weşanên kurdî hatine girtin. Ji alîyê bi bawerî û hêvîyê serdemek e din e ku dibe sedema gumana ku ew kar û xebatên di du sê dehsalên dawî de hatine kirin bibin malê arşîvan; di civakê de cîyê xwe nebînin; derbasî nifşên nû nebin çawa ku Mehmed Mîhrî nikaribû çanda xwe derbasî zarokên xwe bike. Ronakbîr û nivîskarên kurd ew rîsk li pêşîya wan e ku dev ji xebatên xwe heta belkî dev ji hêvîyên xwe berdin bêyî ku rehên xwe berdin ziwa bibin.

Jixwe heta niha jî dema em li piranîya kesayetên naskirî yên di nav sîyaset û çanda kurdî de dinêrin, zarokên ew mezin dikin zêde ferqa wan ji zarokên tirk tunene, ne nivîskar û ronakbîrên kurd nas dikin, ne ji çanda kurdî haydar in ne jî jîyane xwe de pirtûkek kurdî kirîne û xwendine. Em ê bikaribin ji qedera ku Mehmed Mîhrî rûbirû mabû an ji çembera têkçûnan xilas bibin an nebin ne dîyar e.



> Hîlav bi eslê xwe ji Rojhilata Kurdistanê ye û di 1885an de li gundê Deşîyê ya bi ser bajarê Sinê ve hatîye dinyê. Di zaroktîya xwe de bi zîrektîya bal kişandîye û li bajarên Bîcar, Sinê, Serdeşt û Hewlêrê xwendina medreseyê temam kirîye û îcazeta melatîyê wergirtîye.

KOVARA KURDISTAN Û ERMEN

Nivîsên Mehmed Mîhrî dikare ji gelek alîyan ve bê şîrovekirin lê çend nivîsên di Kovara Kurdistan (1919) de bi taybetî divê liser bên sekinandin. Ji ber ku ev mesele hê jî neqedîyaye û her tim tê rojevê. Bo lêkolîneke derbarê dîroka têkilîyên ermen û kurd jî dikare bibe çavkanî. Ji ber ku di nav çarçoveya nîqaşên bo Prensîbên Wilson babeta serwerîya neteweyî yên ermen û kurdan nîqaşeke gur heye. Ev nîqaş bêtir di ser gelheya kurd û ermenan re tê kirin. Nivîseke Hîlav, wek bersiva rojnameya Orient News (r.240) bi vî awayî ye. Bi israr îdia dike gelheya kurdan li wan şeş wilayetan ji ya ermenan zêdetir e. Li hemberî aligirîya ermenan, ku bi heqaret û pêşdarazî qala kurdan dike, wan bi qirkirina ermenan sucdar dike û armanc dikin wan ji mafên neteweyî pêbar bihêlin, dikêve polemîkê û bersiv dide hemû îdiayên wan.

Di kovarê de nameya Sertîbê Dêrsimîyê (r.258) ji eşîra Kurmanc bixwe wek belgeyeke dîrokî ye tevî nameya xwînerekî din (r.261) û telgrafa ji Elezîzê bo Kurdistan Tealî Cemîyetî û bersiva wê (r. 265-67), dikare wek bersivek bo nivîsa di Orient News û îdiayên derbarê qirkirina ermenan de bê xwendin. Sertîbê Dêrsimî, behsa şahidîya xwe ya tehcîr û komkujîya ermenan dike û dibêje ev gotina rayedarên dewletê ber guhê wî ketîye “me yên dibêjin ‘zo’ xilas kirin, îjar dor hat ên dibêjin ‘lo’. Behsa tehcîr û komkujîya kurdan ku di 1916an de dest pê kirîye jî dike û gazinên xwe dike digel ku tehcîr û komkujîya ermenan her dem tê rojevê ya kurdan nakeve rojevê û nayê qalkirin. Ev gotina wî dike ku mirov dîsa bi îroya me re berawirdkirinekê bike. Îro jî piranîya sîyasetmedar û ronakbîrên kurd (û elbet yên tirk) nayê dîtin ku qala tehcîr û komkujîya kurdan a di Yekem Şerê Cîhanê de bikin. Bi ser de kurd hemû tawanbarkirinan dipejirînin û lêborîn dixwazin! Kurd çiqas tên sucdarkirin û heta tên bêqîmetkirin, ermen ewqas masûm, ji xeletîyan azade tên nîşandan û berzkirin. Hindik maye di vê meseleyê de tirk ji navberê derkevin an bên jibîrkirin û bi temamî bibe meseleyek navbera kurd û ermenan de.

Li bihişta kitêban:

Jorge Luis Borges

Borges di saxîtîya xwe de bû şahidê du şerên mezin ên cîhanî, û li welatê xwe şeş derbeyên leşkerî û sê rejîmên dîktatorî dîtin. Xwe wekî yekî hizrên wî yên kûr ên sîyasî hebin nedihesiband. Guhê wî ne li polîtîkayê bû, lê li etîk û estetîkê bû. Ji Komunîzm, Nazîzm û antî-Semîtîzmê hez nedikir.

CIWANMERD KULEK

GOTINEK heye, wiha dibêjin: "Meksîkî ji aztekan, perûyî ji înkayan, arjantînî ji gemîyan tên. Jorge Luis Borgesê ku ê bandoreka mezin li edebîyata dewra xwe, piştî xwe –û heta a berî xwe –bikira , di 1899an de li vê Arjantîna ku xelkê ji deverên cuda ên dinyayê bi gemîyan hatibûnê û xwe lê girtibûn ji dayik bû. Mala wan li Palermo, taxeka feqîr a Buenos Airesê, bû. Kalê wî efserekê leşkerî û pîra wî yeka ingilîz bû. Borges ji wê fêrî ingilîzî bû. Bavê wî parêzer bû, aşiqekê edebîyatê bû û xewna wî ew bû ku bibe nivîskar. Borges cara pêşî di kitêbxaneya bavê xwe de kitêb dîtin. Bavê wî li pişta wî bû di peywendîya wî ya bi kitêban re. Borgesê ku pirr hez dikir têkeve wê kitêbxanê û kitêbên di wir de bixwîne, heta dawîya temenê xwe dê jê werê bûya ku her tim di wê kitêbxaneyê de bû.

Dema bû neh salî Prensê Şa a Oswar Wilde ji îngilîzî wergerandibû spanyolî û çend tiştên edebî nivîsîbûn. Kitêbokeka mîtolojîya Grekan jî bi îngilîzî nivîsîbû. Cîhan jê re tije raz û nihênî bûn û mirov bi rêya kitêban digihişt van razan. Çîrokên li deverên dî ên cîhanê qewimîbûn bi xêra pirtûkan dihatin ba wî, dihatin veguhestin bo cî û dema wî û ev sihreka mezin bû. Lehengên wî mirovên di çîrokên R.L. Stevenson, Mark Twain, H.G. Wells û Çîrokên Hezar û Yek Şevê de bûn. Li taxa Palermoyê a Buenos Airesê, ku cîyê tangoyê, pêxwasan û şerrên kêran bû, sebra wî bi van kes û çîrokên ji cîhaneka dî dihat. Şîreta bavê wî, "Eger kêfa te ji kitêbekê re hat, bixwîne; eger kêfa te jê re nehat, deyne, tu ne mecbûr î biqedînî," tu carî ji bîra wî derneket û kitêbên ku kêfa wî ji wan re hat ne tenê ji nû ve xwand, bi wan re jîya û hin caran ji nû ve nivîsand.

Ewropa û sirgûnîya bênav

Di 1914an de, ji ber ku çavên bavê wî xera bûbûn, malbatê biryar da herin Ewropayê, doktorekê pispor ê li Cenevê bibînin. Hînê li wir bûn, Şerê Cîhanê ê Yekem dest pê kir. Malbatê nekarî vegere û sirgûna wan a li Ewropayê dest pê kir. Borges li wir dest bi dibistaneka Fransî kir û bakaloryaya xwe jî li Swîsreyê wergirt. Dora sala 1922an vegerîyan Arjantînê. Mana li Ewropayê tesîreka mezin li Borges kiribû. Bi saya vê dûrbûnê Borges bajarê xwe, Buenos Aires, ji nû ve kişif kir. "Eger ez hemû jîyana xwe li Buenos Airesê mabûma, min ê bi rastî ew nedîta. Dê gelekî nêzîkî min bûya. Salên dûr û dirêj ên xerîbîyê hesreteka dijwar, hesreteka pêwîst xistin dilê min." Piştî vegerê, bajarê bav û kalen wî ê ku ji nû ve kişif kir di hişê wî de bûbû bajarekê ku her tişt lê mumkin e, wekî Romê bi mît û efsaneyan hatibû ava kirin, wekî Bexdayê hêlîna bi hezaran çîrokan bû. Kitêba wî ya yekem a helbestan Fervor de Buenos Aires îlhama xwe ji keşifkirina vî bajarî girtibû, lê Buenos Airesê dê hukmê xwe ne tenê li vê kitêbê, li hemû kitêbên wî bikiraya. Meyxaneyên berdûşan, mêrên ku bi hev re tango dikirin, cotên li kuçeyan, şerê kêran, pêxwasên bajêr, nivîsên bi dizî ên namûsê, vê jîyana tundîyê û detayên bêhejmar ên di bajêr de veşartî bûn gelekî bala wî dikişand, Îlyada qedîm û sagayên Vîkîngan dianîn bîra wî. Ziman, erdnîgarî û çîrokên Buenos Airesê (helbestên gauchoyan, Pampayên bê ser û ber) jê re wekî kanîyeka bêbinî bûn.

Xewn, rastî û kitêbxaneya gerdûnî

Seydayên Bûdîstan ên ku digotin jîyan îluzyonek e heta dawîya temenê wî di aqlê wî de man. Jibo Borges gewhera rastîyê di kitêban de bû, di xwandina kitêban de, di nivîsandina kitêban de û di heqê kitêban de. Lewma nivîskarîya wî, nivîs û çîrokên wî jî timî wekî guftûgoyekê ne digel kitêbên dî. Gerdûn kitêbxaneyeka mezin bû û Borges guh didêra li pistepista di navbera van kitêbên di ser dem û qonaxên dûr re gihaştibûn hev û dî.

Wî xwe wekî xwandevanekî, wekî xewnbînekî, carina jî wekî nivîskarekî didît. Ji nexşeyan, ji tîpografîyên sedsala 18emîn, ji bêhna qehweyê hez dikir. Ji qewla Borges, pirr kêm tişt hatibûn serê wî, lê wî gelek tişt xwandibûn, bi rêya xwandinê fêr bûbû, ji wan hez kiribû. Kêm tişt jîyabûn ku ji bo wî ji hizrên Schopanhaeur yan muzîka gotinên Îngilterê hejatir bin. Metnên wî gelek caran di heqê metnan de bûn, egerçi lehengên çîrokeka wî nivîskarekê rastî yan xeyalî jî bûya, ji kesayetî yan jîyana vî nivîskarî bêhtir berhema wî dibû navenda çîrokê. Detayên jînenîgarî ên van lehengan ji bo wî ne grîng bûn.

Borges wiha bîr lê dibir ku tişta ku dihat serê yekî dibû ku bihata serê her kesî. Hevalekê bavê wî hebû, Macedonio Fernandez, di kitêbeka xwe de fikrên Plato û fîlosofên dî, wekî ew berê hîç nebûbin, ji nû ve didît, disêwirand. Fernandez pir kêm dixwand û pir kêm dinivîsand, lê gelekî difikirî û gelekî xweş dipeyivî. Haya wî jê tunebû ku berê ew fikir hatine werar kirin. Ev bûbû nimûneyeka mezin a ramana xwerû bo Borges, ku anegorî wî "her kes dişê her tiştî bifikire." Ji bo Borgesê ku tiştên metafîzîkî ên wekî demê, xewnan, rasteqînîyê û hebûnê ji xwe re kiribûn mesele ev bû derîyekê nû; rîya dîtin û dahênana tiştekê bêhejmar caran, ji nû ve, mimkun bû. Bi vê şêwaza xwe ne tenê nivîskarên di rabirdûyê de li gor xwe ji nû ve zindî kir, her wiha, heçku, nivîskarên di pey xwe re jî afirandin.

Jibo Borges gewhera rastîyê di kitêban de bû, di xwandina kitêban de, di nivîsandina kitêban de û di heqê kitêban de. Lewma nivîskarîya wî, nivîs û çîrokên wî jî timî wekî guftûgoyekê ne digel kitêbên dî. Gerdûn kitêbxaneyeka mezin bû û Borges guh didêra li pistepista di navbera van kitêbên di serdem û qonaxên dûr re gihaştibûn hevûdî.

Kovar û heval

Dema malbata Borges li Ewropayê bû, Borges li Spanyayê hin helbestkarên ku ji xwe re digotin "ultraîst" nas kirin. Ligor vana, metafor gewhera helbestê bû. Borges jî di bin tesîra wan de ma û dema vegerîya Buenos Airesê, wî jî di birrek kovarên bi navê Proa, Destiempo, Prisma û Critica de li ser vê xetê nivîs weşandin. Di 1931an de xortekê 15 sal ji xwe piçûktir nas kir: Adolfo Bioy Casares. Casares dê bibûya heval û hevkarê wî yê heta mirinê. Herduyan bi hev re gelek çîrok û ceribandin nivîsandin bi mexlesa H. Bustos Domecq. Hevkarî û nivîsîna bi hev re bo wan derseka "nefspiçûkîyê" bû. Çunkî, ji qewla Casares, "ji nivîskarekê we ye ku dikare her tiştî, bi tena serê, xwe binivîse." Lê bi hev re gelek problemên nivîsînê çareser dikirin û Borges ji hevkarîya bi Bioy Casares re fêrî sadebûn û zelalbûnê bû di nivîsînê de.

Victoria Ocampo ya ku Borges û Casares bi hev dabû naskirin kovarek derdixist bi navê Sur. Vê xanima dewlemend û zîrek dixwast kultura arjantînî şanî cîhanê bide û cîhanê bîne Arjantînê. Borges gelek çîrokên xwe û ceribandinên xwe di vê kovarê de weşandin. Pirtûkên wî di nav weşanên vê kovarê de derketin. Bi saya vê kovarê Borges dest pê kir derheqê sînemayê jî de binivîse, vî formê hunerî ku wî ew wekî "kataloga rasteqînîyê" didît.

Polîtîka

Borges di saxîtîya xwe de bû şahidê du şerên mezin ên cîhanê, û li welatê xwe şeş derbeyên leşkerî û sê rejîmên dîktatorî dîtin. Xwe wekî yekê hizrên wî yên kûr ên sîyasî hebin nedihesiband. Guhê wî ne li polîtîkayê bû, lê li etîk û estetîkê bû. Ji Komunîzmê, Nazîzmê û Antî-Semîtîzmê hez nedikir. Çunkî "Ez bi wê têgihiştinê mezin bûm ku divê takekes bihêz be û dewlet lawaz be. Ez nikarim dilxwazê wan teorîyan bim ku anegorî wan dewlet ji takekesan girîngtir e." Di salên 1930yî de ultra-nasyonalîstên arjantînî iddîa kirin ku ew cihûyekê nepenî ye. Wî jî bi gotareka "Ez cihû me" bersiva wan da. Li dijî nazîzmê nivîsand û ew rexne kir. Di dema dîktatorîya Perónê dilxwazê Almanyaya nazîyan de ji karê xwe hat avêtin. Dîya wî û xweha wî avêtin hepsê. Dema Perónîst di 1976an de dîsa hatin hilbijartin, wî ew wekî "hikûmeteka çeteyan" bi nav kir. Bawerîya wî a bi demokrasîyê, nexasim li welatê wî, nema. Demokrasîya Arjantînê wekî bikaranîna statîstîkan di fêdeya nebaşan de bû. Gava di 1976an de hevalekê wî ragihand ku cûntayeka leşkerî Perón ji textê wî walgerandîye, ji kêfan girîya. Di tarîya zerik a korbûna xwe de, ku ne rojname dixwandin ne zêde kes didîtin de, pesnê rejîma leşkerî da li hember hikûmetên berê ên ku gelek kuştin, revandin û tahde li xelkê kiribûn, bêyî ku bizane wê rejîma leşkerî jî heman tişt dikirin. Dema pê hesîya û zanî, aciz bû û nema hişt ku nivîsên wî di rojnameyeka ku piştgirîya hikûmeta wan dikir, La Nacion, de derkeve. Bêhêvîtîya wî û nerîna wî ya li vê lîstika trajîk a li ser sehneya welatê wî, mîna vê gotinê bû ku berî mirina xwe bi demeka kin di helbesteka kurt de nivîsîbû : "Şerê du keçelan ê liser şehekî."

KORBÛN Û TARÎTÎYA ZER

Di 1945an de çavên Borges êdî xera bûbûn. Bijîşkan li Borges qedexe kiribû ku li ber ronahîya qels bixwîne. Rojekê di trênê de kitêbeka dedektîfan dixwand. Ronahî hêdî hêdî diçilmisî. Trên ket tûnelê. Gava trên ji tûnelê derket, Borges êdî ji binî de nedidît. Tenê mij û dûmaneka rengîn li ber çavên wî dixuya. Berevajî rengê reş ku ji me wiha ye kor tenê wî dibînin, rengê ku Borges didît zer bû -yekane rengê ku di tevahîya jîyana xwe de dît. Ji wê deme şûn de êdî pêwîst kir yek jê re bixwîne û binivîse. Gelek kes ji bo wî di ber vî karî de rabûn, lê a ku herî pirr ev tişt kir dîya wî bû. Dîya wî ya ku berê ji mêrê xwe re xwandibû vêga ji wî re dixwand û tiştên ku wî digotin dinivîsandin.

Piştî ketina hikûmeta zordar a Perón, Borges bû gerînendeyê Kitêbxaneya Netewî. Vê avahîya mezin a tije kitêb bo wî wekî bihiştê bû. Ji bextê Borges re ku ewqas ji sîmetrîyê hez dikir herdu gerînendeyên berî wî li wir kar kiribûn jî kor bûn. Li gor Borges her sîmetrî ji sazûmanekê dihat, ew nîşana wê bû ku ew ne di kaosê de lê di kozmosê de dijîn. Eger sîmetrî hebe, nexwe qeder jî hebû.

Mirin yan çîrokeka nû

Borges her tim difikirî ku du heb Borges hene: ê ku dinivîse û ê ku dijî. Ê ku dimeşîya, ê ku qehwe vedixwar tenê dijîya jibo ku Borgesê dî çîrokên xwe birêse. Borgesê nivîskar tenê çîrok negotin, çîrok guhertin jî, û ne tenê awayê nivîsînê awayê xwandina me jî guhert. Roj bi roj ciwantir bû, navûdengê wî dem û qonax derbas kirin û li temamê dinyayê belav bû. Herçî Borgesê dî ye, ê ku êdî digihaşt dawîya temenekê dirêj, nexwast li Buenos Airesê bimire û berê xwe da Cenevê. Miameleya ku vî welatî bi xerîban û penaberan re kiribû hîç ji bîra wî neçûbû. Li vir fêrî berbihêrîyê (toleransê) bûbû. Di 1986an de li vî welatê ku zemanekî lê gelekî şa bûbû koça xwe ya dawî kir. Biheşt ji bo wî kitêbxane bû û vî mirovê ku gelekî ji mirêkan, maskeyan, labîrentan û pilingan hez dikir niha li hemû bihiştên cîhanê ye.

J.M.Coetzee derheqê wî de dibêje : "Wî ji her kesî bêtir zimanê fîksîyonê (fiction) nûjen kir û bi vî awayî rê liber nifşekê giranbuha ê romannivîsên Amerîkaya Spanyolî vekir."

FIRAT CEWERÎ

Erich Auerbach û Mimesisa wî

Dibe ku ev sernav bi hinan ji we xerîb were. Loma, heqê we heye ku hûn bipirsin; Erich Auerbach kî ye, Mimesis çi ye? Digel ku Erich Auerbach di dîroka entelektueliya dinyayê de navekî giran û Mimesisa wî jî kitêbeke sereke ye, dîsa jî li Tirkiyeyê û dibe ku li Rojhilatanavîn jî kêm kes wî û berhema wî nas dikin.

Heke Mehmed Uzun bi nexweşiya kanserê nekata û zû ji nav me koç nekira wî ê li ser nivîskarê Mimesisê, Erich Auerbach, romanek binivîsanda. Uzun di salên berî mirina xwe de pir konsantreyî vî alimî bûbû û li her derê behsa wî dikir. Mîna jiyana Memduh Selîm Beg û ya Celadet Alî Bedir-Xan, Mehmed Uzun ê bi rengekî spehî, kirasekî xweşik ê edebî li Erich Auerbach û berhema wî ya nemir Mimesis bikira û bikira ku hem kurd, hem jî tirk bala xwe bidin vî alimî û li ser berhema wî hûr bibin. Ez nizanim ka bi zanebûn e an jî bi nezanî ye ku ev alim û berhema wî li Tirkiyê hatiye bincilkirin û di bêdengiyê de hatiye jibîrkirin.

Min bi xwe ne zûde navê Erich Auerbach bihîstiye. Ez cara pêşî di salên nodî de bi tesadufî li kitêbxaneyeke Swêdê pêrgî navê wî hatim, lê heta hingî jî min tiştekî wî nexwendibû. Min berê ev nav ji Mehmed Uzun jî nebihîstibû. Mehmed Uzun di salên xwe ên dawî de pişta xwe dabû Swêdê û berê xwe bi Tirkiyê vekiribû. Piştî ku çûn û hatinên wî ên Stenbolê zêdetir bûn, wî dest pê kir û behsa vî navî kir. Wî dixwest Erich Auerbach di serê xwe de bikemilîne û ji romaneke xwe re bike lehengê sereke.

Erich Auerbachê ku alimekî cihûyê alman bû, xwe ji ber zilma nazîstan dabû alî û di sala 1935an de berê xwe dabû Stenbolê. Stenbola kozmopolît hemêza xwe ji Erich Auerbach re vekiribû û jê re donzdeh salan mazûbantî kiribû. Lê heke mazûban baş be jî, sirgûn bi êş e. Digel ku Erich Auebach dixwest êşa xwe ya sirgûnê bi analîz û afirandina berhemên edebî û lêkolînên ilmê edebiyatê bike jî, dîsa mirov bi taybetî ji nameyên wî fêhm dike ku wî êşeke sirgûnê jî kişandiye. Ew di nameyeke xwe de weha dinivîsîne. "Ez ji aliyê paşverûyan ve wek biyanî, ji aliyê antisemistan ve wek cihû, ji aliyê nasyonalîstan ve jî wek alman, an jî biyanî dihatim dîtin".

Digel wê jî, Auerbachê erbabê ilm û zanînê, bi qîmetê dema xwe ya sirgûnê dizanîbû û hemû dema xwe bi xwendin, lêkolîn û nivîsandinê dibuhurand. Herçiqas wî gelek ji dema xwe dabe lêkolîna li ser Dante jî, dîsa ew herî pir bi kitêba xwe ya bi navê "Mimesis" navdar e. Yê min jî, her ku riya min bi Stenbolê diket û ez diketim kitêbfiroşan, min çavên xwe li Mimesisê digerand. Gava min ew li ba kitêbfiroşan peyda nedikir, min berê xwe dida ba kitêbfiroşên antîk û bi hêvî bûm ku ez ê wê kitêbê li wir peyda bikim. Gava min ew li wir jî nedîdît, ez bi xemgînî û destvala vedigeriyam.

Gelo maqûl bû ku ev kitêba ku li Stenbolê hatibû nivîsandin û yek ji kitêbên dinyayê a sereke ku analîza edebiyateke sêhezarsalî dike, wernegeriyabe tirkî?

Gava min fêhm kir ku ew wernegeriyaye tirkî, bi rastî ez acêbmayî mam û ez aniha jî ecêmayî dimînin. Ji ber ku tirk, piştî avakirina komarê û bi taybetî jî di dema wezîrtiya Hasan Âli Yücel de girîngiyeke mezin dane wergerê û hema bêje hemû klasîkên dinyayê wergerandine tirkî. Dema ku Hasan Âli Yücel di salên sihî û çilî de wezîrê perwerdê bû û dest bi reformên kulturî û hunerî kiribû û giranî dabû ser wergerandina edebiyata dinyayê, Auerbech li sirgûna Stenbolê noqî berhema xwe ya bi navê Mimesisê bûbû. Digel ku ev berhem wek berhemeke sereke ya analîza edebiyatê tê dîtin û demeke ewçend dirêj di ser re bihuriye jî, hê ew wernegeriyaye tirkî. Ez nizanim çima heta niha vê berhemê bala weşanxane û entelektuelên tirkan nekişandiye û heta niha xwendevanên zimanê tirkî ji xwendina wê bêpar hatine hiştin?

Erich Auerbach di Mimesisê de gotina nivîskî ya pîroz wek bingehê edebiyatê digire û dîroka edebiyatê ya sê hezar salan di bîst beşên kitêbê de analîz dike. Ew ji Tewratê û Odysseusa Homeros dest pê dike, herdu berheman dide ber hev, li ser karakter û rastiyên pêbawer ên herdu berheman hûr dibe, bi sernavên balkêş heta dema me tê û li Virginia Woolfê radiweste...

Erich Auerbachê ku di sala 1892an de li Berlînê hatibû dinyayê, di sala 1930yî de bûbû profesorê fîlolojiyê, di sala 1935an de ji ber zilma nazîstan li Stenbolê bi cih bûbû, di sala 1947an de ji Stenbolê koçî Amerîkayê kiribû, di sala 1957an de jî wefat kiriye.

Derhêner Filiz Işık Bulut:

Zelal çîroka jinan e

Karaktera fîlm Zelal bi lawê xwe Îbo re dijî. Mêrê wê mirîye. Wer di malê deye. Rojekê hevala wê Seherê jê dixwaze ku ji dêvla wê biçe kar. Zelal li cîyê ku çûyîyê li tiştekî jibîrkirîye rast tê.

SIWAR BEDIRXAN

Di Mîhrîcana Îf Stenbol a Fîlmên Serbixwe de kurtefîlmê derhêner Filiz Işık Bulut jî hate nîşandan. Di 23ê Sibatê de derfeta me jî çêbû ku em li fîlmê temaşe bikin û digel derhênera fîlm Filiz Işık Bulut, prodoktor Selahattin Bulut û lîstikvana fîlmê Devrim Karadağ sohbetê bikin. Kurtefîlmê Işık Bulut behsa serborîya mirovan a li metropolan dike. Işık Bulut, bi fîlmê xwe xwestîye xirecira bajêr, tenêtîya mirovan, rewşa jinan bi ritm û sembolan vebêje.

Karaktera fîlm Zelal bi lawê xwe Îbo re dijî. Mêrê wê mirîye. Wer di malêdeye. Rojekê hevala wê Seherê jê dixwaze ku ji dêvla wê biçe kar. Zelal li cîyê ku çûyîyê li tiştekî jibîrkirîye rast tê.

Zelalê kî ye?

Derhêner Filiz Işık Bulut, piştî temaşekirina fîlmê bersiva pirsên me dide û ji me re behsa çîroka Zelalê dike:

"Çîroka Zelalê çîroka jinên derdora min e. Jinên tenê... Tenêbûn û Zelalê wekîhev in. Min xwest ez di vê fîlmê de kesên ku li taldeyan mane û hayê kesî ji wan tune; ew kesên ku hisên wan qeşa girtine bikişînim... Wek kulîlken di sîyê de mabin û derkevin ber tavê... Vî zemanê em tê de ne, jin di sîyêde, karker di sîyêde û zimanê kurdî di sîyêde... Di fîlmê de min xwest ev tiştina bên dîtin. Wek lorîneke li ser jîyaneke tune hatibe nihurandin.

"Zelal wek dayikekê çi wezîfên wê hebin dike. Êşa Zelalê ne êşek ku mirov pê bimre. Wek hisek ku ji kar û barên dinyayê dor nehatibê û weha veşirtî û tevizîbe. Car caran tevzîk li hestên wê bidin jî çendak şûnde ji bîr dike û xwe hînî jîyana xwe ya tenê dike. Adet çi be wêya dike. Pê li dilê xwe dike û li mala xwe rûdine."

Filiz Işık Bulut: Ez dixwazim çîrokên jinan bikşînim.

"Ez dixwazim çîrokên jina bibêjim. Ji îfadekirina livên hisên vejirtî û bi çûk hez dikim. Em giş bi çîroka Zelalê zanin. Îro di her malekê de Zelalek heye. Min xwest ez çîroka zelalê bibêm û derdê wê hebekî sivik bikim."

Derhêner Işık Bulut ku heta niha li Amedê jî fîlm kişandine, behsa koçberîya kurdan a bo Stenbolê dike û eşkere dike ku Stenbol mekanêkî muhîm e bo fîlm kişandinê û wiha dibêje:

"Li bajarên mezin hemû kes ji hev gelekî dûr in û bi karê xwe re mijûl in. Roj çawa derbas dibe nabînin. Jiber vê min xwest çîroka jîyana bajarekî metropolê xuya bikim. Derketina derve, rêveçûna li ser rêyekê û çûyina derekê. Min xwest ez Zelalê bimeşînim. Meş azadîye. Rojekê Zelalê Ji dêvla hevaleke xwe diçe atolyeke solan. Li wê derê ji bo ku mirov pê bimeşin sol têne çêkirin."

Di beşeke din a sohbeta me de dîmenên kewşînkên(kumrî) ku Zelalê nan danîye ber wan tên pêş çavê min, ez pirsa kewşînkan dikim; Kewşink ji ku derket in?

Filiz Işık Bulut dibişire û wiha dibêje: "Ez demeke dirêj li jina ku rola Zelalê bilîze, gerîyam. Ev kes divêt mîna kewşînkekê bûya. Kewşînk û jin ji hin alîyan dişibin hevdu. Kewşînk wek nîşaneya hezkirinênê û hevparîyê ye. Cot digerin. Baskên jîyana bê evîn jikestîne. Kewşînkên li derve difirin û azad in. Heyata xwe dijîn. Zelalê jî di mal de wek kewşînkek keviri bê deng û bê his e. Guhertinên piçûk di jîyana mirovan de guhertinên mezin çê dike. Selahattin hertim wisa dibêje: "Tu kevirekî piçûk diavêjî avê, piştî vê mewcên mezin çê dibin." Divêt ji bo veguhestinên mezin tiştên piçûk bihêne kirin."

ZELAL LI MALÊ HATÎYE ZINDANÎ KIRIN

Listikvana sereke ya kurtefilma Zelal Devrim Karadağ jî behsa filma zelal û listikvanîya xwe dike. Ew dibêje Filizxanê bo listikanîyê ew ecibandibû û wê piştî xwendina senaryoyê gelekî ji senaryoyê hezkiribû û dest pê kiribû. Karadağ wiha dibêje: „Filizxan ez ecibandibûm bo lîstikvanîyê, gazî min kir. Min senorya xwend û çîroka Zelalê di mejîyê min de zelal bû. Gelek kêfa min ji Zelalê re hat. Çi ma hat? Jiber ku em jin gelek belangaz in. Di her zemanî de di kîjan holê de jî be, ango li malê be, ango liser kar be; ango perwerdeker be; çi jî be, dîsa jî jin li paş in. Zelalê û lawikê xwe tenê mane. Zilamê wê tine û di civakê de gelekî belangaz e. Di hundir de maye. Hestê xwe ji bîr kirine. Jîyan ji bîr kirîye. Bi hevala wê re jîyana wê diguhere. Wê çaxê fêr dibe ku jîyan çiqas xweş e. Evîn heye; jîyan heye. Azadî heye. Ev tişt jibo min gelekî piroz bû. Jiber vê jî min got "Erê" û min wilo dest pêkir. Zelal ji Kurdistanê hatîye. Zilamê wê tine. Di jîyana metropolê de jineke wisa dijî. Di metropolê de jî hindur derneketîye. Bi tena serê xwe ye. Zelal tu wisa bikî eyb e. Zelal derneketî derve eyb e. Tu herî bişuxilî eyb e. Ango tu bi zilamekî re rûnê eyb e. Yanî wilo lê kirine, nikaribû derkeve derve."

SALEHATTIN BULUT: ZELALÊ ÇÎROKA JINA YE

Prodoktorê fîlmê Zelalê nivîskar Selahattin Bulut jî behsa proseya derketina fîlmê dike û radigihîne ku çîroka Zelalê ev demeke dirêj e di hişê Filizê de ye. Jiber derfetên aborî û kêşeyên din wan film taloq kirîye û kişandina fîlmê bi derengî ketîye. Piştî ku fîlm hat kişandin û wan temaşe kir, ji temaşavanan jî gelek gotinên baş bihistin e. Bulut behsa xebata Filizxan dike û dibêje: "Filiz fîlmên xwe di du-sê rojan de dikşîne, lê berî wê du-sê mehan liser difikire. Min nizanibû jibo çi diçe atolya solan. Mesela heta min got, 'Ev atolye ne pir fireh û baş be, tu dixwazî em cîyekî din bibînin.' Got: 'Na, ez vê atolyê dixwazim.' Piştre min fêm kir jibo çi atolya solan xwestîye. Gava Zelal wer di malê de bi, ji xwe sol jî ne hewceye, lê wextê Zelalê ji malê derkeve, wê çaxê Filizê dixwaze wê bibe atolya solan û sola di bîra wê de bîn e ."

Di beşeka din a sohbetê de Selahattin Bulut destnîşanîyê bi rola karakterê fîlmê Mahmûd dike. Bulut dibêje serborîya Mahmûd û Zelalê yek e û ew jî weke Zelalê bi tenê ye. Di nava kar û xebatê de haya wî ji xweşîyên cihanê tuneye. Û dîsa vedigere ser Zelalê û ji me re dibêje: " Zelalê tenê ye. Mêrê wê tine. Çi bi mêrê wê bûye ne dîyar e. Lê em dizanin ku jineke kurd mêrê wê tine be ne bi emrê Xwedêye.